## Rastiya ku di bin dara sêvê de hatiye veşartin!

Hinek çîrok, agahî û delîl binax dibin û bi xwediyê xwe re diçin û hinek jî binax dibin û tên parastin. Dema kesên xwedî tecrûbe, ji vê dinê bar dikin û tên binaxkirin, dilê meriv tê guvaştin, hesta windabûna xwe li giyana me belav dike û pê re windabûna agahî, tecrûbe, çîrok û serpêhatiyan... ***Sozdar Koçer / R.2***



## Çend gotin li ser belgefilma 'Jin'ê

Belgefilma bi navê Jin (Woman-en) ya ku derhênerî û senaryoya wê ji aliyê Anastasia Mikova û Yann Arthus-Bertrand ve hatiye çêkirin ji 50 welatî, behsa çîrok û hestên 2 hezar jinen ji cîhanê dike. Ev belgefilma ku bi kadrajeke berfireh jinên cîhanê anîne gel hev wek fersendeke ronîkirina bêedaletiyê ye... ***R.11***




# xwebûn

14-20 HEZÎRAN 2021 HEJMAR: 78 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Bantûstana Başûr

Dema mirov realîteya dawî ya li Başûr bi ya dema rejîma nîjadperest a Afrîkaya Başûr re bide her hev, dikare qala destpêka bantûstanbûyina başûr bike. Bantûstanên li Afrîkaya Başûr li ser kaxizê xweser heta hin ji wan serbixwe bûn. Lê kontrola esas di destê dewletê de bû û rejîma apartheidê kengî bixwesta dikaribû mudaxaleya van herêmên bikira. Tirkiye jî heta niha kengî xwest ket nava erdên Başûr. Hevkariya bi Tirkiyeyê re ji dijberiya her du aliyan a li hemberî PKK'ê derbastir kiriye û veguheriye têkiliya bi efendiyekê re... ***Necat Ayaz / R.8***



### Li dijî provokasyonên KDP'ê bertek zêde dibin

*Dewleta tirk di operasyona dersînor de tengav bûye û di demên dawî de KDP bi provokasyonan diçe hawara dewleta tirk. Li dijî êrîş û provokasyonên KDP'ê nerazîbûn zêde dibin. Hunermend, rewşenbîr, siyasetmedaran bang li KDP'ê kirin ku bila dewleta tirk wan wekî amûrê şer bi kar neyne û di nav kurdan de şerê navxweyî nedin destpêkirin... **R.6***

## KDP bi şûrê tirkan êrîşî kurdan dike

KDP hêzek gendêlî kirî, zengîniyên gelê kurd pêşkêşî dewleta tirk kiriye. Heta qirka xwe ketiye nav çala herî û qirêjiyê. Ketiye destê dagirkeran. Ji ber qirêjiyên li hemberî gelê kurd pêk anî, xwe spartiye dagirkeran. Xuya ye ku KDP dê vê îxanetê ranewestîne. Bixwaze jî êdî nikare. Tevgera Azadiya Kurdistanê jî çewa heta niha li hemû qadên heyîn li dijî dagirkeran heta guleya dawiyê têkoşiya ye, dê li hemberî îxanetkar û xwefiroşan jî têbikoşe. Ji bo wê divê kes xwe nexapîne. Vê rewşê wekî "Şerê birakujiyê" bi nav neke. Ev ne şerê birakujiyê ye. Ev şerê welatperwerî û îxanetê ye. Îxanet ser bikeve dê dagirker bi ser bikevin û Kurdistan winda bike. Welatperwer jî ser bikevin dê dagirker û îxanetkar têk biçin. Her tiştî pir zelal e û bêdengî cesaretê dide îxanetkaran...
***H. Halît Alaçati / R.7***

## Utopyaya berbiçav: Li vir û niha

Hêvî û îdeaya jiyaneke azad û wekhev di dîroka mirovahiyê de bi gelek nav û baweriyan derdikeve pêşberî me. An bi rêya olan, an bi navê bîrdozî û têkoşînan, an jî wek berhemên wêjeyî ev hêvî bûye mijara gelek fenomenên civakî. Bêguman ên herî zêde serê xwe bi vê mijarê re êşandine, rêxistin û kesên civakî û sosyalîst bûne. Pirtûka Thomas More ya bi navê 'Utopya' di hêviya civakeke azad de mînaka herî tê zanîn e. Utopya wek peyv tê wateya 'cihê ku nîn e'. Di pirtûka Thomas More de jî qala civakeke ku ne di roja me de lê di cîhaneke dûr de, di giravekê de dijîn, tê kirin...
***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***

## Nirxandinek li ser pirtûka Hedilî

Kamran Simo Hedilî di pêşgotina çapa duyan de dibêje ku; ' lê piştre tê gihîştim heke navê pirtûkê bibûya 'Pêxemberê Jibîrbirî Manî' dê rastir bibûya. Ev pirtûk her çend bi awayekî romanî hatibe nivîsîn jî di esasê xwe de xwe dispêre lêkolîn û lêgerîneke li ser şopa Manî ya bîst salan. Niviskar bi xwe dibêje ku ev bîst sal e li ser şopa Manî bi xwe ye. Lê fikra romankirina jînenîgara Manî û ola wî û resimkirina wê heyamê ji ber ku daneyên li ber dest heya cihekî wî dibin dertê holê. Ev jî li gorî min rêya herî serkeftiye ji bo şexsekî dîrokî bêyî ku bikeve tu kêmasiyeke zanistî an jî pêşiya tu nîqaşan vebike.... ***Îrfan Yildiz / R.5***

## Bêdengî û sewtek

Bi rasthatinekê ez li hevpeyvîneke Seyidxanî rast hatim. Behs dikir, behsa kela xwe, behsa rûmayinên xwe, behsa şikestinên xwe wek ku behsa bîr'êşên xwe bike behs dikir. Lê di her peyvê de di her herikîna hêvokên xwe de car li ser carê, ken li ser kenê, bişirîn li ser bişirînê bû. Yek cara behsa zarokatiyê û yek caran jî dihat û li ser milletê xwe; yek caran li ser êşa xwe û yek caran jî li ser neteweya xwe radiwestiya, lê her û her dikeniya, dibişirî. Meha çûyî ya îlonê wî albûmeke bi navê "BÎR" saz kiribû ku di nav de him ên ji destên wî him jî kilam-strînên gelerî hebûn, derçû... ***Hoşeng Elî / R.12***



# Grevê 200 roj li pey xwe hişt

Girtiyên siyasî 200 roj in li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ne. Piştî greva birçîbûnê li girtîgehan zext zêde bûn. Komîsyonan rewşa girtîgehan lêkolîn kirin û bang li rayedarên dewletê kirin ku dev ji pêkanînên dijmirovî berdin û tercîdê bi dawî bikin. Komîsyona Şopandina Girtîgehan a Herêma Anatolyaya Navîn têkildarî tecrîd, grevên birçîbûnê û zextên li girtîgehan raporek amade kir. Li ser navê komîsyonê parêzer Omer Faruk Yazmaci daxuyanî da û diyar kir ku grevên birçîbûnê li 107 girtîgehan dewam dike û her wiha ji 7'ê tebaxa 2019'an vir ve li hemû girtîgehan tecrîd hatiye girankirin. Yazmaci da zanîn ku dewleta tirk bi hinceta pandemiyê tecrîd girantir kiriye û hemû maf tên binpêkirin... ***R.3***

VAHAP IŞIKLI

## Şewitandina daristanan rêbazeke şer e... *R.3*

## Pêşbirka rojnamegiriyê

28'emîn Xelatên Rojnamegeriyê yên Şehîdên Çapemeniya Azad a Mûsa Anter ya îsal jî tê lidarxistin. Serlêdanên ji bo pêşbirkê dest pê kirin. Pêşbirk ango xelat di beşên "Nûçeyên Kurdî", "Nûçeyên Tirkî", "Wêne (wêneyên nûçeyan)", "Karîkatûr" û "Nûçeyên Jinan" were lidarxistin. Endamên pêşbirkê dê di 18'ê îlonê de bên aşkerakirin. Pêşbirk îsal jî ji aliyê Rojnameya Yenî Yaşamê ve tê lidarxistin. Zimanê pêşbirkê kurmancî û tirkî ye... ***R.11***



## Çanda xwe dide nasîn

Têkildarî hevsengiya di navbera rojnamegeriyê û nivîskariyê de û der barê wergirtina Xelata Beverly Hills de Sîrwan Qiço ji rojnameya me re axivî...
***Hevpeyvîna Evîn Hesen / R.4***

## Rastî dikare mirov biêşîne lê...

Van dem û rojên em tê de ne mijarên ku mirov bixwaze li ser binivîse, gelek in. Hemû mijar jî girîng in û girêdayî qeder, paşeroj û rewşa me kurdên hemû Kurdistanê ne. Dema êşek weke baranê bi ser aliyêkî Kurdistanê da dibare, zêdetir ji dengê feqîr û hejaran wira, hinek dixwazin hemû civak dengê wan bibihîze!. Xwe hunermend, rewşenbîr, nivîskar, siyasetzan û heta xwediyên dozê dihesibînin. Ez ê di vê nivîsê de navê hinek kesan li rex helwesta wan binivîsim û hêvîdarim bêyî dilmayîn bizanin ka armanc çi ye û çima wiha dinivîsim. Bila ew ji bîr nekin ku: Rastî dikare mirov biêşîne lê qet kesî şermezar nabe. Nizamettin Arîç ku salên dirêj e li ser hunera kurdî dixebite bi rêya twittekê li ser şehîdbûna pênc pêşmergeyên kurd nivîsiye... ***Kakşar Oremar / R.8***

# Rastiya ku di bin dara sêvê de hatiye veşartin!



Sozdar Koçer

Hinek çîrok, agahî û delîl binax dibin û bi xwediyê xwe re diçin û hinek jî binax dibin û tên parastin. Dema mirovên têr û xwedî tecrûbe, ji vê dinê bar dikin û tên binaxkirin, dilê meriv tê guvaştin, hesta windabûna xwe li giyana me belav dike û pê re windabûna agahî, tecrûbe, çîrok û serpêhatiyan. Sed heyf û mixabin. Axê ew daqurtand. Di heman demê de jî, di rewşên xeter, şer û tengasiyê de mirovan agahî, dîmen, zêr/pere û dokumentên xwe binax dikirin. Ji aliyekî ve mirov spartin axê û di heman demê de ax wan tiştan spart, parast. Ax e, herdukan jî di hundirê xwe de dihewîne – mirin û vejînê, destpêkek û dawîbûnek. Di gelek vegotina çîrokên şer de, em leqayî şîrovekirinên – 'ermenan zêrê xwe di bin wê darê de veşartibûn', 'Dayik/Bavê me Dokument, Film, Qaset nêzî wî xaniyî veşartibûn', 'nêzî wê bîrê','di wî dîwarî de' ... her nîşaneyek hebû, îhtîmala vegerê, hêviya dê wan tiştên binaxkirî dîsa bibînin hebû. Ez dixwazim di vir de behsa çîrokekê bikim, behsa lîsteya navên zarokan bikim ku bi heman şêwaz û helwestî di bin dareke sêvan de hatin parastin. Zêdetirî 2 hezar û 500 nav. Navên zarokên cihûyan.

**Rûyê şer ê jinan tuneye**

Ez behsa 'Schindler´s List– Lîsteya Schindlerî' nakim. Na. Ez behsa ,Irena´s List – Lîsteya Îrenayê' - behsa jinekê dikim. Jineke çeleng û jêhatî – jineke ku divê kiryarê wê bi Schindler re neyê qiyaskirin. Ev çîrok hêjayî vegotinê ye, ji ber ku em dizanin di her şer û têkoşînan de, çîrokên jin û zarokan bi tenê wek qurbaniyên şer tên şîrove û pênasekirin. Wek nivîskara rûs Swetlana Alexijewitsch pirtûka xwe binavkirî 'rûyê şer ê jinan tune' ye, digel ku milyonek jin li sovyetê û di gelek têkoşînên dîtir de di çeperan de şer kirin. Berovajî wê çîrokên lehengên şer bi tenê yên mêran tên nivisîn, dibin film, belgefilm û di civakê de tên behskirin. Yên jinan, di bêdengiyê de difetisin. Ev nêrîna yekalî valatiyeke pir mezin di rastiya civak, şer û dîrokê de dihêle.

**Jina bi navê, 'Dayika zarokên holokostê', 'Irenas´s List', navê kod 'Jolanta' ango bi navê rastî 'Irena Sendler' kî bû?**

Irena Sendler di sibata sala 1910'an de li Warşowa Polonyayê ji dayik dibe û beriya Şerê 2'yemîn ê Cîhanê beşa wêjeya polonî û beşa dadê dixwîne. Piştî tevlihevî û aloziya ku di destpêka salên 1930'an de li Ewropayê rû dide û alman di 1'ê Îlona 1939'an de Polonyayê dagir dikin, Şerê 2'yemîn ê Cîhanê bi fermî dest pê dike. Di wê demê de Sendler dibe şahidê dijberkirina cihûyên li Warşowê û li dijî vê newekheviyê xwe birêxistin dike. Sendlerê di destpêka şer de xwe di xebatên civakî û hemşîretiyê de pêş dixe û bi temenê 29 salî, di îdara beşa 'social work - xebatên civakî' ya Bajarê Warşowê de kar dike. Karê xebatkarên civakê ew bû ku alîkariya mirovên bêmal û xizan ên bajêr bikin. Piştî xurtbûna naziyan û pêşketina rêbazên tunekirina cihûyan, Sendlerê destûr ji bajarê Warşowê distîne ji bo ku bikaribe li getoya cihûyan a Warşowê, wek karmenda civakê û hemşîreyê kar bike. Di sala 1940'an de, bi awayekî pergalî li gelek bajarên Ewropayê geto – taxên mezin ji bo komkirina cihûyan dihatin avakirin- li geto ya Warşowê nêzî 400 hezar cihû hatin bicihkirin. Rewşa wê getoyê her diçû xetertir dibû, nexweşî derdiketin û gelek kes dimirin ango dihatin kuştin. Naziyan di nava demeke kin de nêzî 280 hezar cihû ji wê getoyê birin Treblinkayê (Qampa qirkirina komî ya cihûyan). Sendlerê jî şahidê van bûyeran e û di sala 1942'an de biryar dide û tev li meclisa piştgiriya cihûyan a bi navê, Zegota' dibe. 'Zegota' rêxistineke dijqanûnî ye û Sendler jî dibe yek ji pêşengên wê. Ev rêxistin roleke gelek mezin di parastin û veşartina cihûyan de listiye.

**Rêxistina veşartî 'Zegota'**

Di sala 1943'yan de Sendlerê ji aliyê rêxistina veşartî 'Zegota' ve wek berpirsyara piştgiriya zarokên cihûyan di getoyê de tê binavkirin. Di nav wê rêxistina îlegal de navê wê yê kod 'Jolanta' ye. Sendlerê têkiliyên xwe bi mal û rêxistinên zarokên bêkesan re datîne, da ku bi nasnameyên sexte zarokên cihû ji getoyê, ji kuştinê xilas bike.

Di heman salê de Sendlerê li gor delîlên heyî nêzî 2 hezar û 500 zarokên cihûyan di rêya kanalîzasyonên bin erdê de û di xaniyên li sînorê getoyê de bi nasnameyên nû derbasî derve dike. Zarokên ber şîr jî bi dermanê razanê di çiwal an sindoqan de ji getoyê rizgar dike. Piştî derketina ji getoyê êdî rêxistina 'Zegota' ku gelek endamê wê hebûne, wan zarokan li cihên cuda û bi nasnameyên nû vedişartin. Ji bo ku malbatên ji şer filitîne paşê bigihîjin zarokên xwe, Sendlerê lîsteya wan zarokan bi nasnameya kevn û ya nû û cihên lê hatine veşartin, dinivisîne û di şuşeyeke cam de, di bin dareke sêvan de vedişêre. Di dawiya sala 1943'an de Gestapo (artêşa naziyan) bi Sendlerê dihese û wê digirin, îşkence dikin û biryara qetilkirina wê didin. Digel wê rewşê jî, Sendlerê cihê lîsteya navên zarokan negot. Bi alîkariya 'Zegota' yê ku rişwet dane leşkerekî naziyan navê Sendlerê ji lîsteya mirinê hate derxistin û ew wisa ji mirinê xilas bû.

**Bi tesadufî navê wê tê dîtin**

Piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê, Sendlerê lîsteya veşartî radestî Komîteya Navendî ya Cihûyan a Polonyayê kir. Û piştî wê demê, bêdengî – di qada çîrokên lehengên mêr de windabûn... 50 sal bi tenê hiştin, tevî wan dîmen û çîrokan.

Hîn nû di sala 1999'an de bi tesadufî di hinek belgeyên ku xwendekarên dîrokê yên Amerîkayê li ser lehûrbûn çêdikirin de navê wê dikeve û ew dikevin pey şopa wê lehengê. Bi vê tasadufê hîn nû cîhan bi çîroka wê dihese. Hîn nû di sala 2003'yan de Polonya radibe madalyaya 'Qertelê Spî ji bo wêrekî û lehengî' dide. Rast e, piştî çi!? Û di sala 2009'an de filmê bi nave 'The Courageous Heart of Irena Sendler' tê kişandin. Axir, ji tunebûnê baştir e.

**Bi hezaran çîrokên jinên berxwedêr**

Li beramberî çîroka vê jinê, 'Schindler's List' – Lîsteya Oskar Schindlerê alman ku cihûyan wek karmendê fabrîqaya xwe dixebitand û wan wisa ji qampên naziyan xilas kir, di sala 1982'yan de wek belgefîlm deng veda û di sala 1993'yan de Hollywoodê filmê bi navê 'Schindler's List' kişand. Kêm zêde her kes dizane ew kî ye û çîroka wî çi ye.

Ka li ber wî, çîroka Irena Sendler çi bû? Lehenga ku çîroka wê di bêdengiyê de hate hiştin û bi tesadufan jiya, di sala 2008'an de - penc sal piştî nasînê, çelengê jiyana xwe, bi tenê, di odeka xwe ya mala extiyaran de li Warşowê ji dest da. Heyf û xebînet...

Ev çîrokek e û bi hezaran çîrokên jinên berxwedêr û leheng hene, lê mixabin nayên zanîn. Bi hezaran çîrokên jinên me kurdan hene, lê mixabin nayên nivisîn! Bi tenê ax dizane, çend leheng di hundirê xwe de hewandine. Û çend delîlê çîrokan hîn jî di bin axê de veşartî ne û li bendê ne werin dîtin. Wek di destpêka nivîsê de gotî, spartina axê heye û axê wan spart heye, di bin dareke sêvan de.







Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Utopyaya berbiçav: Li vir û niha

Hêvî û îdeaya jiyaneke azad û wekhev di dîroka mirovahiyê de bi gelek nav û baweriyan derdikeve pêşberî me. An bi rêya olan, an bi navê bîrdozî û têkoşînan, an jî wek berhemên wêjeyî ev hêvî bûye mijara gelek fenomenên civakî. Bêguman ên herî zêde serê xwe bi vê mijarê êşandine, rêxistin û kesên civakî û sosyalîst bûne. Pirtûka Thomas More ya bi navê 'Utopya' di hêviya civakeke azad de mînaka herî tê dizanîne. Utopya wek peyv tê wateya 'cihê ku nîn e'. Di pirtûka Thomas More de jî qala civakeke ku ne di roja me de lê di cîhaneke dûr de, di giravekê de dijîn, tê kirin. Pirî caran utopya wek jiyaneke îdeal a di pêşerojê de tê şîrovekirin, lê di rastiya xwe de li ser rexneya newekheviya civakî ya hemdemî hatiye fikirîn. Lê utopya her çendî be pirî caran di wateya pergala civakeke pêşerojî de tê bikaranîn. Ango di pênasekirina pêşerojeke hatina wê ne diyar de.

Tevgerên civakî, taybetî yên sedsala 19 û 20'an, pênasekirina têkoşînên xwe yên ji bo jiyaneke azad, bê çîn û bê sînor wek îdeaya utopyayê tînin ziman. Şoreş dê di dawiyê de wê pêşeroja xweş pêşberî me bikira. Diviyabû ku em nebînin, lê dê nifşên nû, ew nebînin jî yên dîtir dê wan rojan bidîtana. Tişta herî xweş a di vê xewnê de ew bû ku rê ji binketinê re tunebû. Lewre tiştê ku di pêşerojê de biqewime, dê teqez biqewime û serkeftî be, ji rexne û kêmasiyan azad be.

Rê û rêbazên dê me bigihînin wan rojên azad li gorî hişmendî û baweriyan diguherî. Du helwestên sereke di rêdiyariyê de derketin pêş: yek jê ku em bêjin dîsa giranî tevgerên sosyalîst ên sedsala 19 û 20'an dişopandin, digot, divê em li hemberî pergala heyî şer bikin, têbikoşin, di dawiyê de bigihîjin azadiya xwe. Helwesta duyemîn, ku em bêjin ji nîvê duyemîn ê sedsala 20'an şûndetir bi taybetî bi pêşketina hişmendiya hestiyar a derbarê avûhewayê (ekolojîk) de derket pêş jî digot, guhertina ku em dixwazin divê em bi xwe bijîn. Heta ev gotin referansa xwe ji Gandhî digirt. Gandhî gotibû "bibe guhertina ku tu dixwazî li cîhanê bibînî" (be the change you want to see in the world). Ango guhertina ku tu hêvî dikî, taloqî pêşerojê neke, li vir û niha bijî û ji xwe destpê bike, bû gotina pîroz a vê demê. Ji vê rêbazê re jî gotin polîtîkaya pêşsêwirî (prefigurative). Di vê baweriyê de gelek komên bi taybetî ji welatên rojavayî ji xwe re înîsiyatîfên alternatîf ava kirin. Bi komên wek baxçewanî, komgehên civakî, dikanên ekolojîk û xwecihî û hwd. xwestin di navbera xwe û pergala kapîtalîst de sînoreke tûj deynin û eleqeya xwe jê neynin. Ji van înîsiyatîfan re di lîteratura tevgerên civakî de 'înîsiyatîfên çalik' (niche initiative) tê gotin. Di nava pergala heyî de, di qalikê kevin de, ji xwe re kuncekî, cîhaneke nû, saz dikin û jiyaneke alternatîf tê de dijîn. Angaşta herî bingehîn ên van înîsiyatîfan ew bû ku digotin, 'ev pergala kapîtalîst nasname û xweseriya me ji me distîne, divê em hefsarê ji stuyên xwe derxînin.' Rastî jî ji bo demekê derxistin. Lê ber bi roja me ya îro ve, hat dîtin ku kesên ku di nav koman de ne, têkiliya xwe ya bi pergala kapîtalîst re ji binî qut nakin, an jî nikarin bikin. Wek mînak, bangewaziya jiyana ekolojîk dikin, lê dîsa jî ji betlaneya xwe ya bi balafirê li welatên dûr, kêm namînin. Bi zanebûn li dijî zarokanînê ne, li gorî wan hem dinya ne ji bo zarokan e û hem jî nifûsa zêde zirar e, lê zirara xwe ya ji avûhewayê re bi jiyana xwe ya bi yekserî û tam tekmîl nabînin. Li hêla din lêkolîner dibêjin, êdî gelek kes bi çi awayî be jî di pergala kapîtalîzmê de xweseriyê (wek mînak tevgera serbixwe, lê bi rêya pereyê) dibînin. Û ji ber ku kapîtalîzm heta rehên civakê xwe gihandiye, mirov zû bi zû nakevin nakokiyan. Ango bo wan hem ekolojîk-bûn û hem jî li balafirê siwar-bûn ne nakokî ye, pêdiviyeke du serî ye û vê helwesta xwe bi xweserîbûnê pênase dikin. Ev analîz bi giranî li ser hînbûyînên jiyanên rojavayî hatine çêkirin. Lê dema mirov ligel qeyranan erjengî û belavbûna bêserûber a pergala kapîtalîst bişopîne, dibîne ku êdî ev ne tenê taybetmendiyên mirovên rojavayî (yên di nav refah û dewlemendiyê de) ne. Lewre ev pergal hem cazîbeya xwe, hem şerudiya xwe bi hev re dimeşîne. Li hêla din di çalekê de utopya xwe jiyîn û karê xwe ji yên din neanîn, sedema din a xitimandina wê hêviyê bû.

Ji bo derketina ji vê nakokiyê hin pêşniyar hatin û tên kirin. Hin dibêjin veqetîna radîkal yekane çareserî ye; hin dibêjin di qalikê kevin de jiyana nû nabe, hin gotin jiyana şaş rast nayê jiyîn û hin jî gotin, ne li hemberî qalikê kevin li hemberî nakokiyên xwe yên ku ji kapîtalîzmê re çav diniqîne, divê mirov têbikoşe.

Her çiqas pergala kapîtalîst mirovan dorpeç kiribe û mirov ketibin nav pençeyên wê jî, hîn jî mirovatî ji nirxên xwe yên etîk dest bernedaye. Li gorî lêkolînan tê gotin dibe ku mirov kapîtalîzmê ji xwe re carcaran wek îluzyoneke kurtedemî wek platformeke xweavakirinê bibînin û ev yek di wan de rûniştibe. Lê di heman demê de mirov li dû lêgerîna xwebûnê ne. Ev hesta xwebûnê her tim li rû û rûmeta mirov dikeve û mirov dikeve lêgerîna civaka bi exlaq û polîtîk. Hefteyeke din ez ê li ser lêgerînên xwebûnê û rêbazên avakirina wê bisekinim.

# Greva birçîbûnê 200 roj in didome

Navenda Nûçeyan

**Girtiyên siyasî 200 roj in li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ne. Piştî greva birçîbûnê li girtîgehan zext zêde bûn. Komîsyonan rewşa girtîgehan lêkolîn kirin û bang li rayedarên dewletê kirin ku dev ji pêkanînên dijmirovî berdin û tercîdê bi dawî bikin**

Girtiyên PKK û PAJK'ê ku li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin, ket roja 200'emîn. Herî dawî li girtîgehan koma 40'emîn çalakî dewr girt. Çalakiya li Mexmûrê zêdetirî 180 roj û ya li Yewnenistanê jî nêzî 170 roj in dewam dikin.

Komîsyona Şopandina Girtîgehan a Herêma Anatolyaya Navîn têkildarî tecrîd, grevên birçîbûnê û zextên li girtîgehan raporek amade kir. Li ser navê komîsyonê parêzer Omer Faruk Yazmaci daxuyanî da û diyar kir ku grevên birçîbûnê li 107 girtîgehan dewam dike û her wiha ji 7'ê tebaxa 2019'an vir ve li hemû girtîgehan tecrîd hatiye girankirin û wiha got: "Ev li dijî Rêgezên Mandela ya Neteweyên Yekbûyî, pêşniyarên CPT'ê û Qanûna Înfazê ya hejmar 5275 e. Pêwîst e Wezareta Dadê demildest tecrîdê bide rawestandin, girtî bi parêzer û malbata xwe re hevdîtinê pêk bînin."

**Pandemî bûye hinceta tecrîdê**

Yazmaci anî ziman ku dema çûne serdana girtîgehan girtiyan gelek binpêkirinên mafan anîne ziman û wiha axivî: "Bi hinceta pandemiyê girtî tên tecrîdkirin. Girtiyên ku dikevin greva birçîbûnê dixin hucreyên yek kesî. Dema girtî dikevin greva birçîbûnê hemû mafê wan ên jiyanî yên wekî pirtûkxane, spor û mafên din tên astengkirin. Dema girtî dixwazin ji bo tedawiyê biçin nexweşxaneyê bi hinceta pandemiyê daxwazên wan tên redkirin."

**Pêkanînên li hemberî mirovahiyê**

Her wiha ji aliyê rêveberiyên girtîgehan ve pêwendiyên girtiyan yên paqijiyê tên astengkirin û gardiyan her roj pêkanînên dijmirovî li ser girtiyan ferz dikin. Yazmaci destnîşan kir ku li gorî qanûnan îşkence û pêkanînên xirab sûc e û divê demildest dev ji van pêkanînan berdin.

**Banga li dijî tecrîdê**

Komîsyonê herî dawî bang li rayedarên dewletê, Wezareta Dadê, Wezareta Karê Navxweyî, Wezareta Tenduristiyê, Komîsyona Lêkolîna Mafên Mirovan kir ku li hemberî tecrîdê rabin û peywira xwe bi cih bînin. Komîsyonê wiha got: "Divê girtiyên ku ketine greva birçîbûnê ji aliyê bijîşkên serbixwe ve kontrola wan a tenduristiyê were kirin." Komîsyonê herî dawî bang li dewleta tirk kir ku tecrîd were bidawîkirin.




**Venêrîna şandeyên serbixwe**

Koordînasyona Şopandina Girtîgeha Mêrsînê, der barê binpêkirinên mafan ên li Girtîgeha Tîpa T a Tarsûsê tên jiyîn de civîna çapemeniyê li dar xist. Civîn li Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ya Mêrsînê, hat lidarxistin.

Parêzer Bedrî Kûran li ser navê Koordînasyonê axivî û wiha got: "Ligel hemû hişyariyên rêxistinên mafên mirovan jî, binpêkirinên mafan ên li girtîgehyan, çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîdê û pirsgirêkên girtiyên nexweş dewam dikin. Tecrîd, îşkence, qedexeyên keyfî, muameleyên xirab, cezayên dîsîplînê, karantînaya yek hucreyî û pirsgirêkên sewqkirina nexweşxaneyê yên bi hinceta pandemiyê zêdetir bûn, gefê li jiyana girtiyan dixwin. Rêjeya tijebûna girtîgehan gihiştiye asta metirsîdariyê. Wekî din, li her girtîgehê pêkanînên cihêreng tên dîtin û cudahiyê dixin navbera girtî û hikumxwaran. Dema ku ceza hat dayîn, bêyî ku tawanek hebe, têkiliya kesan bi tawan re qut dibe. Ji ber vê yekê, divê qanûna înfazê bi heman awayî li ser her kesê ku ceza lê hatiye birîn were sepandin. Divê ol, ziman, nijad, nêrîna siyasî û çîn neyên cuda kirin. Lê belê, di serdema desthilatdariyê de, ev peymanên ku Tirkiye jî girê dide, têne paşguh kirin."

# Şewitandina daristanan rêbazeke şerê taybet e

Navenda Nûçeyan

Ji salên 1990'î heya niha bi hinceta operasyonên leşkerî yên li Kurdistanê daristan tên şewitandin. Di encama van şewatan de bi hezaran kes ji cihê xwe koç dikin û cureyên ajal û nebatan kêm dibin. Li her deverê cîhanê agir bi daristanan dikevin, ji bo temirandina agir hewl tê dayîn û li hember polîtîkayên xwezayê yên şaş gelek bertek tên nîşandin. Lê dema mijar dibe dar û daristanên Kurdistanê dinya ker û lal dibe.

Agirên ku li daristanên Garê, Gabar, Cûdî, Pîran, Dêrsim û Liceyê derketine bi rojan e dewam dikin û nahêlin ku şêniyên herêmê agir bitemirînin. Der barê şewitandina daristanan de endamê Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê Vahap Işiklî ji rojnameya me re axivî.

**Bêdengiya parazvanên xwezayê**

Vahap Işiklî li dijî şewata daristanan bêdengiya parazvanên xwezayê rexne kir û wiha got: "Dema xwezaya Kurdistanê tê talankirin bi gelemperî sazî û dezgeyên ekolojiyê yên Tirkiyeyê û dinyayê bêdeng dimînin. Dema em bertek nîşan bedengiya wan didin dibêjin rewşa welatê we rewşa awlehiyê ye. Li aliyê din dizanin talankirina xwezayê perçeyeke ji şerê taybet e û ji ber wê bêdeng dimînin."


**Piştî operasyonan şewat**

Işiklî anî ziman ku armanc talankirin û wêrankirina xwezayê ye û wiha got: "Şewatên daristanên Kurdistanê jî bi taybetî piştî operasyonên leşkerî derdixin û piştî agir qeleqol û qereqolan ava dikin. Par hem li Licê hem jî li çend deverên Tirkiyeyê agir bi daristanan ketibû. Wezareta Daristan û Çandiniyê ji bo agirên wê demê lîsteyeke amade kiribû lê di nav lîsteyê de cih nedabû şewata li Licê."

**Naxwazin bibe rojev**

Işiklî da zanîn ku bi talankirina xwezayê bi kurdan re şer tê kirin û wiha got: "Bi rojan e ku agirê di navbera Pîran û Elezîzê de berdewam dike û nahêlin ev agir bê temirandin. Di talankirina Kurdistanê de gel koç dikin. Koçkirin tena serê xwe fizîkî nîne bi fizîkê re hiş jî diguhere. Ev guhertin mijareke asîmîlasyonê ye. Em bi rojane hewl didin ku agirê li vir têxin rojevê û dixwazin agir bê temirandin. Lê ew di TV'yên xwe de dibên me agir temirandiye. Rastî ev e; li çend cihên ku agir temirandine dest bi avakirina qeleqol û qereqolan kirine. Dema em agirê daristanan bi vîdeoyan parve dikin Wezareta Daristan û Çandinêyê dibêje hûn propagandaya rêxistinê dikin. "

Işiklî da zanîn ku dê di demeke kin de têkildarî talankirina xwezaya Kurdistanê rapora 5 salên dawî amade bikin û dê vê raporê bi raya giştî û Ewropayê re parve bikin.




## Li Cûdiyê meşa li dijî talanê

Nûnerên partiyên siyasî û rêxistinên sivîl li dijî şewitandina daristan û birîna darên li Çiyayê Cûdî, li bajaroka Gundikê Melê li hev civiyan û ber bi qontara Çiyayê Cûdî ve meşiyan. Hevserokê Civaka Demokratîk (KCD) Berdan Ozturk, Hevserokê Giştî yê Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) Keskîn Bayindir û parlamenterên HDP'ê Hûseyîn Kaçmaz, Tûlay Hatîmogullari, Dersîm Dag, rewşenbîr, hûnermend jî di nav de bi sedan kes tevlî meşê bûn. Di dawiya meşe de daxuyanî hat dayîn. Di daxuyaniyê de pankarta "Xweza hebûna mirovahiyê ye werin em bi hev re li xwezayê xwedî derkevin" hat vekirin. Dovîzên "Xweza jiyan e, Cudî rûmet e xweza hebûn e, Cudî dişewite, daristan dişewitin" hatin rakirin.

# Hiqûqnasan piştgirî dan malbata Şenyaşar




Çalakiya nobeta "Edaletê" ya Malbata Şenyaşar a li pêş Edliyeya Rihayê nêzî 100 roj in berdewam dike. Serdanên piştevaniyê yên Malbata Şenyaşar didomin. Endamên Navenda Giştî ya Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD), şaxên wê yên Wan, Stenbol, Amed û Rihayê, nûnertiya wê ya Dîlokê û Weqfa Lêkolînên Hiqûq û Civakê (TOHAV) li pêş avahiya Edliyeya Rihayê serdana malbatê kir. Ji xeynî Hevserokên Giştî yên OHD'ê Îlknûr Akcan û Bunyamîn Şeker nûnerên şaxan û gelek parêzer beşdarî serdanê bûn.

Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar spasiyên xwe ji şandeya hatin serdana wan re peşkeş kirin û wiha gotin: "Em hêzê ji piştevaniya we hiqûqî digirin û ser piya dimînin." Ferît Şenyaşar, têkildarî pêvajoya dosyayên dozê parêzer agahdar kir û wiha axivî: "Li nexweşxaneya dewletê li pêş xebatkarên cemaweriyê komkujiyek hat jiyîn. Dayika min kesên ku hatin qetilkirin teşxîs kirin lê hêj jî nehatine girtin. Di ser bûyerê re 3 sal derbas bûn lê em dozgerekî muxatab nabînin. Ji bo ku di nav vî karî de parlementerek heye kes naxwaze vê dosyayê bigire."

Hevseroka Giştî ya OHD'ê Îlknûr Akcan destnîşan kir ku di têkoşîna edaletê de weke OHD û TOHAV 3 sal in li cem malbatê ne û wiha got: "Em piştevaniya we dikin ji ber ku rewşa darazê ya li welat di holê de ye. Êdî mirov di eywanên dadgehan de edaletê nagerin ji ber ku daraz lêpirsîneke bi bandor bi rê ve nabe. Hemû Tirkiye dizane ku kujer kî ne. Divê faîl bi lêpirsîneke bi bandor bên cezakirin." ***RIHA***

## MIN XWEST BEŞEKÎ JI JIYANA KURDAN BI XELKÊ AMERÎKAYÊ BIDIN NASÎN

# Çanda xwe bi cîhanê bidin naskirin

Evîn Hesen

*Têkildarî hevsengiya di navbera rojnamegerî û nivîskariyê de û der barê wergirtina Xelata Beverly Hills de, Sîrwan Qiço ji rojnameya me re axivî û hin agahiyên karên xwe bi me re parve kir.*

**Pêşî em romana te ya "Tenê Xwelî" Xelata Beverly Hills ya Amerîkî di rêza duyemîn de wergirt pîroz dikin, tu dikarî hinekî behsa vê saziyê û giringiya vê xelatê bikî?**

Xelata Beverly Hills li bajarê Los Angelesê ji aliyê komîteyekê ve her sal tê dayîn. Romana min "Tenê Xwelî" xelata fînalist di cureya romanên giştî de wergirt. Dema romanek çi xelatê distîne, ew êdî bêtir tê naskirin û şensê wê yê danasîn û belavbûnê zêdetir dibe.

**Şertê wê saziyê ji bo tevlêbûna vê pêşbirkê çi ne?**

Her nivîskar dikare bi berhemên xwe yên wê salê beşdar bibe. Yek ji mercên vê xelatê ew e ku pirtûk bi zimanê inglîzî hatibe nivîsandin û li Amerîkayê hatibe weşandin. Li gor fêmkirina min, piraniya romanên ku beşdarî vê pişbirkê dibin nûhatî ne û di destpêka ezmûna xwe ya nivîsînê de ne. Lê helbet nivîskarên xwedî ezmûn jî beşdar dibin.

**Te çima romana xwe ne bi zimanê kurdî lê bi zimanê ingilîzî nivisand û gelo dê ew wergere kurdî jî an na?**

Armanca sereke ji romana min danasîna xelkê amerîkî bi beşekî ji jiyana kurdan. Ew kesên ku kurdan, bi taybet kurdên Rojava, nas dikin, bi piranî wan bi riya şerê dijî terorê nas dikin. Ew naskirin jî di çarçoveyeke teng de ye. Min dît ku Amerîkî gelek tiştan li ser jiyana wan ya berî salên şer nizanin. Romana min hewldanek bû da ku jiyana kurdan bi riya serpêhatiyên çend kesan ji nêzîk ve nas bikin. Min dikarîbû ev roman bi hêsanî bi kurdî nivîsîba, lê peyamek min li dû nivîsîna wê bi inglîzî hebû.

**Bi giştî karê rojnamegeriyê hinekî astengiyan dide pêşiya nivîskaran di warê berhemdariyê de, te çawa di nava karên xwe yê rojnamegeriyê de karîbû demê ji bo nivîsa romanekê veqetînî?**

Ev rastiyeke karê me ye. Eger tu rojnamevan bî, dê bêguman dijwartir be ku karê xwe yê nivîsandinê li gor dilê xwe bikî. Ev yek jî ji ber xaleke biçûk lê sereke ye: rojnamegerî bi xwe jî rengek ji rengên nivîsandinê ye. Dema mirov du tiştên wek hev di heman demê de dike, dê teqez yek ji wan li ser hesabê ya din be. Ez bi xwe her gav rastî vê nakokiyê têm. Ev bêtirî 14 salan di rojnamegeriyê de dixebitim. Gelek projeyên min yên nivîsînê ji ber siruştiya karê min hatine paşxistin. Wekî mînak, nivîsîna romana "Tenê Xwelî" bêtirî du sal û nîvan bi min re dirêj kir. Di rewşeke normal de, dibe ku di salekê de hatiba qedandin. Lê ji ber pêgiriyên min yên rojnamevanî, ev yek nebû. Min hinek projeyên din dane ber xwe, him roman û him jî lêkolîn. Ez bawer dikim wê dîsa jî demeke dirêjtir bi min re bixwin heta ku ez wan bigihînim serî.

Lê rastiyeke din jî heye divê ez tê de biaxivim. Tucarî nivîsandin ji hev nayê cudakirin. Ji ber wilo ez her gav dibêjim ku karê min yê rojnamevanî û yê wêjeyî hevdu temam dikin. Wekî nivîskar, projeya min ya nivîsandinê li ser her du hêlan didomin. Dawiya dawî dema mirov digihêje astekê di jiyana xwe ya pîşesazî de, êdî tê xuyakirin ka kîjan hêl rola mezintir ji ya din bistîne.

Bi saya lehengiya kurdan di şerê dijî terorê de, dengê Rojava li hemû cîhanê belav bûye. Ez li gelek welatan digerim. Dema xelk dizanin ez kurd im, yekser behs dibe behsa serkeftinên şervanên kurdan. Ev tiştekî erênî ye ji bo wêneya kurdan li seranserî cîhanê. Lê li aliyê din, binpêkirinên li Efrîn û Serê Kaniyê û bajarên din yên Rojava ku ji aliyê Tirkiyeyê ve hatine dagirkirin, baş nayên belgekirin, tevî ku sazî û rêxistinên navneteweyî yên mafên mirov bi dehan caran behsa van binpêkirinan dikin. Lê dîsa jî negihiştine asta ku hikûmet û dewlet vê mijara girîng têxin rojeva siyasetên xwe. Ew guhertina demografîk ku vê gavê ji alî hikûmeta tirk û hevalbendên wan yên sûriyeyî tên kirin, bûyereke metirsîdar e û di dîrokê de wê bibe xaleke guhertinê. Eger îro baş li ser belgekirina vê tawanê nehate kirin, piştî çend nifşan ew ê behsa wê bibe wekî çawa em niha behsa siyasetên kevin yên dijî kurdan wekî Kembera Erebî û Serjimara Awarte ya li Rojava dikin.



Bi saya lehengiya kurdan di şerê dijî terorê de, dengê Rojava li hemû cîhanê belav bûye. Ez li gelek welatan digerim. Dema xelk dizanin ez kurd im, yekser behs dibe behsa serkeftinên şervanên kurdan

**Bi salane tu karê rojnamegeriyê dikî û ji nêz ve rewşa Rojava dişopînî, gelo li gorî te çima ewqasî binpêkirinên mafên mirovan ên ku li hin deverên Rojava û bi taybetî li Efrînê tên kirin, ji alî sazî û dezgehên navnetewî ve nayên dîtin?**

Lobîkirin peyveke berfireh e. Bi gelek şêweyan tê fêmkirin û têgihiştina xelkê jê re her gav ne wek hev e. Di çarçoveya behsa li ser kurdan, girîng e ku karê lobîkirinê bi tenê siyasetê ve neyê girêdan. Niha derfeteke zêrîn heye ku ev yek li Washington û paytextên din yên girîng were kirin. Karê pênasîna cîhanê bi kurdan bi rastî jî hêsan e. Ji xwe di van salên dawî de nav û dengê kurdan li cîhanê baş belav bûye, lê tenê di çarçoveya leşkerî û siyasî de maye. Kurdan kar li ser wê yekê nekiriye ku çanda xwe bi cîhanê bidin naskirin. Dema xelk çand û hunera miletekî ji nêzîk ve bizanin, wê çaxê êdî bêhtir guh dide pirsgirêkên wê yên siyasî jî. Miletên din yên derdora me enerejiyeke mezin li ser vê yekê didin, çima kurd jî wek wan naxebitin? Behaneya ku karîn û şiyanên kurdan tune ne ku karê lobiyê bikin behaneyeke lawaz e. Ji ber vê ez dibêjim niha karê danasîna kurdan bi cîhana ji derve ne di asta xwe ya pêwîst de ye.

**Ji ber ku tu li derveyî welat dijî û bi taybetî li cihekî wekî Waşhingtonê gelo li gorî te divê lobî û dîplomasiyeke çawa were kirin ku kurd rastiya rewşê bigihînin deverên pêwendîdar?**


Berî her tiştî divê kurd wekî kurd li xwe binêrin, ji ber ku cîhan bi xwe wekî kurd li me dinêre. Xelkên biyanî nabêjin ev filan partî ye yan jî filan rêxistin e. Ew tenê me wekî kurd dibînin û divê em jî li ser vê bingehê danûstandinê bi cîhanê re bikin. Wekî mînak, gava kesekî amerîkî pesnê Hêzên Sûriyeya Demokratîk dide, ew tenê dizane ew kurd in. Nizane çi kurd e û jê re ne girîng e çi kurd be. Ev tiştekî pir erênî ye ji bo wêneya kurdan.

**Gelo siyaseta kurd nikare bi rengekî rast rewşa xwe bi hêzên cîhanê bide danasîn û qebûlkirin an jî berjewendiyên wan welatan li pêşiya vê yekê dibin asteng?**


Helbet kurd ne xwedî dewlet in û ev rastî karê wan yê lobîkirinê zehmet dike û dijminên kurdan ji derveyî Kurdistanê jî li ser asta diplomasî şerê wan dikin. Lê gelek tiştên din hene mirov dikare li ser wan bixebite û bi riya wan xwe bigihîne cihên çêkirina biryarê li paytextên girîng. Wekî min got, bikaranîna "hêza nerm" niha êdî bûye alaveke berbelav ku gelek milet û welat bi awayekî karîger sûdê jê werdigirin. Ev yek dibe ku bi riya lidarxistina festîvalên hunerî û çandî be. Dibe ku bi riya sînemayê be. Dibe ku bi riya berhmenên wêjeyî be. Ji xwe danasîna kurdan bi riya siyaseta rasterast jî divê were kirin, lê nabe ku riya bi tenê be.

**Tu niha ji bo demekê li Rojavayî, tu rewşa wir bi giştî çawa dibînî û dema ku jiyana berê ya bajarê xwe didî ber çavên xwe, tu hestekî çawa dijî ?**

Ez berî 15 salan ji rojavayê Kurdistanê derketim. Ez ji cihekî derketim ku tev de bi siyasetên erebkirinê hatibû tarîkirin. Dema ez cara pêşî ji Amerîkayê vegeriyam, min tiştekî din dît. Wekî dîtina nivîsandina bi kurdî li ser kolan û dikanan tenê şokeke mezin bû ji bo min. Gelek tişt li Rojava çêbûne kurdan yekcar bawer nedikir ku dê di demekê kin de derfetên wisa peyda bibin. Bi dîtina min derfeteke wisa her sed salî carekê ji kurdan re nayê. Eger rewşa ewlekarî û aborî li Rojava xweştir bibe, ew ê ev dever bibe derfetek ji bo pêşxistina mirovê kurd, çi di warê mirovahî de be, çi jî di warê çandî û siyasî de. Ez ji dil hêvî dikim ku ezmûna li Rojava were pêşxistin da ku ji dest neçe.




## Sîrwan Qiço kî ye?



Sîrwan Qiço di sala 1986`an de li bajarê Amûdê yê rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê. Ji sala 2008`an û vir ve li Amerîkayê dijî. Wekî rojnamevan li beşa Çavdêriya Tundrêbûnê li radyoya Dengê Amerîka li Washingtonê kar dike. Heta niha 2 pirtûkên wî yên helbestan bi zimanê kurdî û romaneke bi zimanê inglîzî hatine çapkirin. Her wiha Qiço niha dest bi nivîsandina romaneke din a bi zimanê ingilîzî kiriye.

# Nirxandinek li ser pirtûka Kamran Simo Hedilî

Îrfan Yildiz

**Niha sozyalîzm, ger ku em bi navê wan bêjin Mazdakê me sosyalîstê yekem e. Heke humanîst be Maniyê me yê yekem e. Heke bajarvanî be dîsa Zerdeştê me yê yekem e. Em ji vana ne dûr in**

Nivîskar Kamran Simo Hedilî li ser pirsekî wiha dibêje; 'niha felsefeya me, felsefeya ku îro kurd, yan duhoyî kurd, yan pêr kurd ji piştî împaratoriyê em ê bêjin, împaratoriya Medan ku 150 salan hikum kir, sê fîlozofên nemir dane me kurdan. Yê yekem Zerdeşt da me, Zerdeşt em kirine bajarî û gundî. Ji me re got çandiniyê bikin, bicih bibin êdî ne koçerî tenê. Xêr e ku mirov cot bike, erdê bikole, bicih bibe xêr e, kire sewab. Ya duyem Manî ye ku Manî jî ev rastiya me ji ber ku di herêma me de em bi gelek miletan re dijîn, Manî ev felsefe jî anî nava me. Ya mirovheziyê, ya xwezaheziyê, ya wekheviya jin û mêr. Ev hersê tişt anîne nav me. Yê sêyem jî Mazdak e, yanê fîlozofê sêyem Mazdak ji Manî derseke mezin girt. Wexta Manî hate kuştin bi tenê bû. Bê leşker bû, ji ber ku Manî dibêje di destê min de ne şûrê ku însana bikuje heye ne jî dê rake kêreke ku fêkiyan jêbike. Ango ewqasî derwêşek e. Ango dibêje ez ê tu sûran ava nekim lê ez ê tu sûr û bajaran jî ji xwe re qedexe nekim. 'Ez ê bê leşker bikevime hemû sûr û bajaran' felsefeya wî ev e. Mazdak ji vê dersekî digire. Dibêje devera ku ez herimê divê leşkerên min hebin. Wer dike dewleta Sasaniyan esîr digire û dike hepsê. Mazdak hemû hikumdariyê dixe destê xwe. Mazdak dibêje madem em hemû malên xwedê ne û ev dinya jî malê xwedê ye û milkê kesekî nîn e. Wekheviyê tîne, wekheviya Manî îcar di pratîkê de hikum dike.

Ango ev hersê felsefe yên me ne, niha ger ku em werin ser felsefeya xwe ya îro ku em dibêjin bi giranî kurd li dora wê xwe dane hev û lê kom bûne, ne dûrî van felsefeyan e, ev hersê felsefe, senteza van hersê felsefeyan di ruhê me hemûyan de heye. Îro di ruhê Tevgera Rizgariya Kurdistanê de jî heye. Ew sentez in, ne ku ji hev qut in, ango ne ku felsefeyeke nû tê dîtin, hin dijminên me navên dîtir li kurdan dikin. Sozyalîzm, ger ku em bi navê wan bêjin Mazdakê me sosyalîstê yekem e. Heke humanîst be Maniyê me yê yekem e. Heke bajarvanî be dîsa Zerdeştê me yê yekem e. Em ji va na ne dûr in. Yanê em bi wan re ne, em neviyên wan in. Ev in ê ku me dikin em.

Beriya ku em derbasî nirxandina pirtûkê bibin, divê em hinekî behsa van hersê fîlozofên xwe bikin. Da ku em armanca nivîsandina vê pirtûkê zanibin.

**1) Zerdeşt (Zerdeştê Kal)**

Her çend daneyeke piştrast tunebe jî kêm zêde her dîroknasek an jî lêkolînerek dibêje ku Zerdeşt beriya zayîna Îsa sedsala 6'an de jiyaye. Çarçoveya baweriya xwe bi xîmên qehîm daniye û ev di pirtûka xwe ya pîroz Avestayê de bi cih kiriye. Ji pirtûka wî kêm be jî gelek beşên wî heta roja me hatine. Zerdeştî oleke yekxwedayî ye û li gor vê baweriyê di xîmê hebûn û gerdûnê de wekî ku di xîmê hemû zindiyan de jî heye, şerê ronahî û tariyê heye. Temsîliyeta ronahiyê (başiyê) Ahûra Mazda dike û temsîliyeta tariyê (nebaşiyê) jî Ehrîman dike. Hewla her tiştekî ew e ku di vî şerî de ronahî bi ser bikeve. Ango oleke dualistik e, yê li hemberî xwe înkar nake û ji bo ku ronahî bi ser bikeve her tim bi tarîtiyê re di nav şer de ne. Jiyan bi bizav û keftûlefta van her du hêzan pêkan e an jî dikare bidome.

"Baş bifikire, baş bêje û baş bike." Mirov dikare bêje ku destûra herî berbiçav ev e ku exlaqê zerdeştî jî radixe ber çavên me û ya herî girîng jî ew e ku li gor wê heyamê Zerdeşt wekî şoreşekî di sê xalan de ango di sê qadên civakê eleqedar dike de hişmendiyeke nû dide rûniştandin. Li gor vê ev hersê xal mirov dikare wiha rêz bike;

**a) Çandinî**

Di felsefeya xwe de gelek giranî û girîngî daye çandinî û ziraetê, ax û çandina wê jixwe nîşaneyeke şaristaniyê ye. Dizane ku çandinî bingeha şaristaniyê ye û vê wekî sincekî li miletê xwe ferz dike.

**b) Xweza**

Fîlozofê mezin Murray Bookchin di pirtûka xwe ya bi navê ' Ekolojiya Azadiyê' de bi kurtasî dibêje, ji bo ku ev bobelata civakî ji holê rabe divê em cardin bizivirin ser rêbaza xwe ya ku me bi xwezayê re hevsengiyek pêk anîbû. Ango dibêje însan ji dûrketina xwezayê ve esasê xwe de ji esasê mirovahiyê jî dûr ketiye û lewma qeyraneke piralî dijî. Ev xala girîng di felsefeya Zerdeşt de jî xaleke bingehîn e û hevsengiya mirov û xwezayê diparêze.

**c) Jin**

Dîsa di felsefeya Zerdeşt de xala herî bingehîn jin e û cihê jinê di nav civakê de, di tora civakê de cihekî sereke digire. Wekheviya jin û mêr, pîroziya jinê û bi taybetî jî vehonandina jinê ya di çand û civakê de ber bi çav hatiye girtin.

**2) Manî (Pêxemberê Ola Aştiya Rastî)**

Manî piştî Îsa di navbera salên 216-276'an de jiyaye. Ya rastî ji ber ku ev romana birêz Kamran Simo Hedilî li ser jînenîgara Manî hatiye sazkirin naxwazim zêde bikevim hûrguliyan ji ber ku wexta we xwend, hûn ê her tiştî tê de bibînin. Lê dîsa jî divê çend tiştan bînim ziman.

Wekî ku nivîskarê me jî dibêje mirov dikare Manî yekem humanîst bihesibîne. Jixwe felsefeya wî ya ku bi navê Manîheîzm'ê tê binavkirin de jî hema bêje cihê her tiştî û her kesî heye. Li gor felsefeya Manî xweza hebûneke zindî ye, divê tu ziyan lê neyê kirin. Ziyana ku li xwezayê bê kirin alikariya tarîtiyê dike ku ev jî nahêle ronahî an jî başî bi ser bikeve. Kuştina heywanan wekî ya mirovan giran û guneh e. Felsefeya Manî tu kesî ji ber cudatiya wî red nake an jî înkar nake. Ji hemû ol, çand û miletan re wekhev e. Li cem Manî nasyonalîtet tune. Dîsa cihê jinê taybet e û sereke ye, li gor Manî jin û mêr wekî du baskên firindeyekî ne. Ger ji wan a yek kêm be an jî şikestî be ew dem ew firinde nikare bifire. Hevsengiya jiyanê di têkiliya jin û mêr de dibîne û ev hevsengî û wekhevî jixwe jiyan bixwe ye.

**3) Mazdek (Sosyalîstê Yekem)**

Mazdek jî piştî Îsa texrîben di navbera salên 490- 524'an jî 528'an de jiyaye. Mazdek yek ji wan rehîbên (Mux-Magî-Magus) Zerdeştî bû, ya rastî yê herî mezin. Mazdek wekî ser an jî serokê Magan xwe wekî pêxember dide nasîn û mirov dikare bêje ku hem xwedî fikra proto-sosyalîzm û hem jî yekem sosyalîst e. Felsefeya wî jî xwe dispêre dûalîzma Zerdeşt. Mirov dikare Manî hinekî pasîfîst bibîne lê Mazdek li gor wî bêtir radîqal e û gelek kirinên xwe de jî vê yekê dide nîşan. Mirov dikare bêje ola Manî reforme û radîkalîze dike. Li gor wî divê mal û milk li herkesî bên belavkirin û ev jî dê bibe munesebeta xilasbûyîna nebaşiyê, ango têkçûyîna tarîtiyê. Li hemberî her cure mulkiyeta şexsî ye. Ji aliyê têkiliya jin û mêr ve jî ne kêmî Manî ye, di felsefeya Mazdek de jin kole an jî milkê mêr nîn e, berovajiyê vê keseke azad û şîrîkê jiyanê ye.

Ew jî wekî Manî bi destê burokrasî û statûkoya ku nedixwestin dev ji berjewendiyên xwe berdin û ew û felsefeya wî ji xwe re û ji statûya xwe re wekî metirsîneke mezin didîtin, bi xapandin û defikan ve hatiye qetilkirin.

Me bo çi behs wan hersê zana û feylesofên kurd kirin, ji bo ku em armanca vê romanê zelaltir bikin me bi kurtasî ev agahiyên jor dan. Niviskar jî bi xwe dibêje armanca vê romanê danasîna Manî û ya fikra wî ye. Ev zana û pêxemberê ku bi sedan salan bandora xwe bi taybetî li civaka kurd bi gelemperî jî li ser hemû gel, bawerî û felsefeyan kiriye bide nasîn, cardin bibîr bixe û bide zanîn ku ka me nirxekî çawa ji bîr kiriye. Jixwe navê pirtûkê jî 'Pêxemberê Jibîrçûyî MANÎ' lê kiriye. Lê di pêşgotina çapa 2'yemîn de dibêje ku: "Lê piştre têgihîştim heke navê pirtûkê bibûya 'Pêxemberê Jibîrbirî Manî' dê rastir bibûya. Ez gihîştim wê baweriyê ku Manî ji bîr neçûye. Pergal û olên desthilatdar, Manî bi mirovan dane jibîrkirin."

Ev pirtûk her çend bi awayekî romanî hatibe nivîsîn jî di esasê xwe de xwe dispêre lêkolîn û lêgerîneke li ser şopa Manî ya bîst salan. Nivîskar bi xwe dibêje ku ev bîst sal e li ser şopa Manî bi xwe ye. Lê fikra romankirina jînenîgara Manî û ola wî û resimkirina wê heyamê ji ber ku daneyên li ber dest heya cihekî wî dibin dertê holê. Ev jî li gorî min rêya herî serkeftî ye ji bo şexsekî dîrokî bêyî ku bikeve tu kêmasiyeke zanistî an jî pêşiya tu nîqaşan vebike.

Li gor lêkolînên nivîskar, Manî ji Mêrdînê ye, bi xwe jî kurd e. Mirov dibîne ku mîrateya Zerdeştê kurd di xwe û felsefeya xwe de hewandiye û ji bo Mazdekê kurd jî bûye îlham û rêberekî mezin.

**Li ser romanê çend rexne**

- Li gor min karekterên romanê ji bilî Manî zêde nehatine dahurandin. Rexmî gelek karekter tê de hene jî hema bêje tu karekterek bi xuy û xisletê xwe di bîra mirov de namîne.

- Her çend di romanê de diya Manî cihekî girîng digire jî xêncî rola welidandina Manî zêde behsa diya wî Marmacan'ê nehatiye kirin û mixabin roman careke din li Marmacanê nazivire.

- Manî wexta çar saliya xwe de ji dê û warê xwe, ji zarokatiya xwe tê qutkirin, 20 salan jî di nava komeke bawermendên ku cilspî tên binavkirin de dimîne. Jixwe wisa xuyaye ew felsefe û ola xwe li wir li hember hişkbûyîna vê baweriyê wekî antî-tezekî diafirîne. Lê di romanê de em zêde şerê tez û antî-tezê nabînin.

- Gera Manî ji bo belavkirina ola xwe an jî rêxistinkirina gel ji bo biezimîne ola xwe dikaribû berfirhtir û berbiçavtir bihata hunandin.

- Ya herî girîng jî mirina Manî ye, ku mirina pêxemberekî an jî kesayetekî ewqas bibandor û xwediyê gelek şopîner û bawermendan divê bêtir hestewar û bi hûrgulî bihata ziman. Mixabin hema di yek carê de dawiya Manî tê bêyî ku mirov biherike nav êşa mirina Manî.

**Çend xalên serkeftî**

-Herikbariya ziman û çîrokê mirov nikare ji pirtûkê qut bibe. Heya bêje zimanekî xweş û herikbar e. Ziman li gor efsûna wê demê hatiye honandin.

- Navên karekteran gelek balkêş e û li gor demê ye, bawer im li gor lêkolînên nivîskar ev navana navên rastîn in.

- Mekan kurdî û kurdewar e. Mirov xwe xerîb nabîne.

- Nîqaşa di navbera Manî û Katîr (Katîr temsîliyeta Muxan dike di dîwana şahêşahan de) li hember şahêşahan serkeftî ye. Katîr wekî temsîliyeta statukoyê gelekî baş hatiye vehunandin.

- Dîsa dîyaloga di navbera Manî û Hurmiz de (ku Hurmiz êdî dewsa bavê xwe şahêşahan e) gelekî serkeftiye û felsefeya Manî hemû radixe ber çavan. Di vir de Hurmiz ji bo ola Manî bike ola fermî ya împaratoriya xwe hewl dide ku Manî qayîl bike. Beşek ji doyalogê wiha ye;

**Hurmiz;**

- ... Ez niha serwerê vê hikumdariyê me, heta karibim nahêlim xwîn were rijandin. (rp. 294)

**Manî;**


- Ez bawer dikim, heta ji te were tu nahêlî xwîn birije. Lê dijberên te, yên dûr û nêzîk heke karibin dê vê fersendê nedin te. Heke tu dixwazî şahênşahan bî, divê artêşa te ya li dijî neyarên derve hebe. Divê hêza te ji neyarên hundir biparêze hebe... Ji bona tu li ser textê hikumdariyê bimînî, pêwîstiya te bi her du hêzan heye. Şahêşahan bêyî her du hêzan nabe, ew hêz jî bê şer tu wateya wan nabe. Oldariya min jî li dijî şerê hundir û derve ye. Ji ber vê em nikarin barê hev rakin. (rp.294)

**Çend gotinên ji bo dawî;**

Ger em bizivirine ser pirsa ku li serê nivîsê de nivîskarê me bersivandibû di civateke ser medyaya civakê de em dikarin bêjin ku dîrok an jî çand, xislet an jî felsefeya miletan her tim li ser koka xwe şîn dibe. Çand û şaristaniya Zerdeştê Kal, Manîheizma Maniyê nûranî, sosyalîzma Mazdek û bi dehan zana û felyesofan ve bi dehan serhildan û serokan ve heya roja me hatiye. Bo nimûne îro em li gel hemû îxanet û nokeriyan ve li gel hemû dagirker û talankerên hov ve em di rojavayê Kurdistanê de şaristaniya Zerdeşt, xwezahezî, mirovhezî û wekheviya jin û mêr a Manî û sosyalizma Mazdek dikarin bi awayekî şênbêr bibînin. Wexta mirov vê pirtûkê diqedîne mirov hay lê dibe ku ka felsefeya Manî çend di kûr de çûye di hiş û mêjiyê me kurdan de. Lewma jî dikarim bêjim ku nivîskar birêz Kamran Simo Hedilî di vê armanca xwe de bi ser ketiye.



# Li dijî şerê kurd-kurd bertek zêde dibin



Navenda Nûçeyan

## Li ser êrîşên Tirkiyeyê yên li ser axa Başûr û hewldanên PDK'ê, li hundir û derveyî welat gel, hunermend, rewşenbîr û parlamenteran nerazîbûnên xwe anîn ziman

Têkiliyên di navbera Tirkiye û PDK'ê de gihiştiye asteke wisa ku Tirkiye niha her diçe cihê xwe li ser axa Başûr berfirehtir dike. PDK ji aliyekî ve ax û daristanên herêma Başûr difiroşe Tirkiyeyê; ji aliyê din ve ji bo artêşa tirk di şerê ku winda kirî de pêş bikeve, bi hemû hebûna xwe rêhevaltiyê ji Tirkiyeyê re dike û bi vî awayî Tirkiyeyê ji qeyranê xelas dike.

Li gor hin agahiyên ji herêmê hatine parvekirin, Tirkiye komên çeteyan bi balafiran di ser Ammanê re derbasî balafirgeha Hewlêrê dike. Komên çete ji vir jî derbasî devera Haciomeran a herêma Soran û deverên Behdînan ên li nêzî Duhokê tên kirin.

**Bi cilên perşmergeyan...**

Çavkaniyan gotin ku komên çete li Balafirgeha Hewlêrê di bin kontrola MÎT û rayedarên PDK'ê de tên dabeşkirin û ji bo herêman tên şandin. Ji bo ku neyên nasîn jî, cilên leşkerî yên hêzên PDK'ê li wan tên kirin. Hat gotin ku di nava çeteyan de hinek kurdên ji aliyê dewleta tirk ve hatine perwerdekirin jî hene.

**Bertek û nerazîbûnên gel**

Herî dawiyê bertekên li dijî lihevkirina Tirkiye-PDK'ê û bi taybetî jî sekna PDK'ê, li hundir û derveyî welat zêdetir dibin. Ji partî û saziyan, rewşenbîrên kurd heta parlamenter, hunermend, akademisyen, siyasetmedar û herî dawiyê jî bi girseyan gel li hember sekna PDK'ê û lihevkirina wê ya bi Tirkiyeyê re bertek nîşan dan û nerazîbên xwe anîn ziman.

**Gelawêj Hemzî**

Gelawêj Hemzî keça pêşmergeyekî PDK'ê ku di sala 1995'an de bavê wê di şerê di navbera PKK-PDK'ê de canê xwe ji dest dayê. Têkildarî aloziya heyî Hemzî wiha got: "Ez bavê xwe wekî şehîd qebûl nakim û bi tu awayî şanaziyê bi şehîdbûna wî nakim. Ji ber ku ew di şerê 'Birakujîyê' de hatiye kuştin."

**Şandeyên parlamenteran**

Şandeyek ji parlamentoya Iraq û başûrê Kurdistanê di 8'ê hezîranê de ji bo lêkolînkirina zirar û ziyana êrişên dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê, çûbûn herêma Behdînanê. Endamê Lijneya Hevbeş a Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistan û Iraqê Şino Eşqî ragihand ku dewleta tirk ji bo talankirina malê xelkê, xweza û darbirînê pêngavek berfireh daye destpêkirin.

**Banga hunermed û rewşenbîran**

Herî dawî jî hunermend û rewşenbîrên ji çar parçeyên Kurdistanê der barê planên Tirkiyeyê yên li ser Kurdistanê û hewldanên PDK'ê de, li Almanyayê daxuyanî dan. Hunermend û rewşenbîran bang li hemû hêzên kurd kirin ku li dijî planên dewleta tirk hişyar bin û ji Mesût Barzanî xwestin ku rê li ber şerekî kurd-kurd bigirin.

Hunermendan bi taybet bang li Serokê PDK'ê Mesut Barzanî kir ku li pişt gotina xwe ya wekî 'Êdî şerê birakujiyê heram e' bisekine û rê nede ku şerekî din ê kurd û kurd derkeve.

**Li Qamişloyê meşa rûmetê**

Bi deh hezaran şêniyên kantonên Qamişlo û Hesekê yên herêma Cizîrê bi dirûşameya 'Li dijî dagirkerî û xiyanetê meşa rûmetê' beşdarî mîtîngêbûn. Di meşa rûmetê de endamên Tevgera Mezopotamya ya Çand û Hunerê bi cilê xwe yên folklorî, endamên Partiya Lîberal, endamên Partiya Yekitiya Suryan, Partiya Roj a Demokratîk li Sûriyeyê, Kongreya Star, Partiya Yekitiya Demokratîk , Partiya Sûriya Pêşerojê û saziyên civaka sivîl beşdar bûn. Her wiha di meşê de bang li PDK'ê hat kirin ku hevkariya xwe ya bi dewlet tirk re bi dawî bike û nebe sedema tunekirina destkeftiyan.

### 'Tirkiyeyê ji me xwest ku...'

Yek ji mînaka ku têkiliyaTirkiye-PDK'ê bi awayekî vekirî datîne ber bi çav jî gotinên Serokê Komeleya Dadger ê Kurdistanê Elî Bapîr in. Elî Bapîr li Brîtanyayê di semînerekê de, der barê nêzîkatiyên PDK'ê de wiha got: "Carek me bi Hemeî Hacî Mehmud re serdana Tirkiyeyê kir, li wir em bi Wezareta Derve ya Tirkiyeyê re civiyan. Berpirsên Tirkiyeyê ji me xwestin em PKK'ê weke 'terorîst' binav bikin. Min li wir vê pêşniyarê red kir lê nûnerên PDK û YNK'ê li wir gotin ku ew ê bi mekteb û siyasiyên xwe re vê yekê bişêwirin."

Elî Bapîr diyar kir ku wî di wê civînê de li hember daxwaza Tirkiyeyê ev tiştgotiye: "Pêwîstiya min bi şêwiriyê nake û ez li vir ji were dibêjim. Ji ber ku PKK bi Tirkiyeyê re şer dike, ez PKK'ê weke 'terorîst' pênase nakim. Ji ber ku PKK parastinê li miletek mazlum dike. Ev bersiva min gelek zora wan çûbû."

## Karayilan daxwaza dewleta tirk aşkera kir

Hefteya borî der barê nêzîkatiyên PDK û hevkariya wê ya bi Tirkiyeyê re, Endamê Komîteya Rêvebir a PKK'ê Mûrat Karayilan ji Stêrk TV re axivî. Karayilan ragihand ku li gor agahiyên ketine destê wan; Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê Hulusî Akar ji rêveberiya PDK' re gotiye 'lazim e pêşmerge jî beşdarî şerê dijî PKK'ê bibin' û di 20'ê gulanê de rêveberiya PDK'ê ji bo vê yekê civiyane.

Di berdewama axaftina xwe de Karayilan ragihand ku serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan heyetek şandiye cem PKK'ê û wiha got: "Beriya vê çend mehan bi rêya hinek dostan dewleta tirk, heta Tayyîp Erdogan bi xwe jî ji me re agahî şandin û gotin 'di hundirê Tirkiyeyê de ango li bakurê Kurdistanê hûn agirbestê îlan bikin, lê li beşên din ên Kurdistanê hûn çi bikin jî em mijûl nabin. Ango li hemberî agirbestê, va ye nakokiyên we bi PDK'ê re hene, herin bi wan re şer bikin."



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Provokasyonên bi hevkariya PDK-Tirkiyeyê

Êrîşên dewlata tirk yên li dijî başûrê Kurdistanê dewam dikin. Ev êrîşên piralî rastî berxwedana gerîlayên HPG û YJA-Starê hatin. Dewleta tirk ya ku li dijî gerîla nikare li herêmê bigihêje armanca xwe ya dagirkeriyê, bi hevkariya PDK'ê, dixwaze ji van êrîşan encam bigire.

Di emcama vê hevkariyê de PDK di 5'ê hezîranê de hêzeke leşkerî sewqî herêma Metîna kir. Konvoya hêzên taybet ên KDP'ê ku ber bi herêmên gerîlayan ve diçû li Metîna rastî êrîşê hat, di encama êrîşê de 5 kesan jiyana xwe ji dest dan û 7 kes jî birîndar bûn. Di heman rojê de, artêşa Tirk bi SÎHA'yan êrîşê wargeha Penaberan a Mexmûrê kir. Bêgûman ev êriş ne tesadufe, bi sewqiyata ber bi Metînayê ve girêdayî ye.

Ji ber vê yekê mirov dikare bêje êrişên dagirkeriya dewleta tirk ên li dijî başûrê Kurdistanê di 5'ê hezîranê de derbasî qonaxeke nû bû. Li dijî vê hevkariya PDK'ê li çar aliyên Kurdistanê bertekên tund pêşketin. Di serî de siyasetmedarên başûrê Kurdistanê û gelek aliyan, ev hevkariya PDK'ê rexne û şermezar kirin.

Siyasetmedarên ku rewşê dinirxînin van provokasyonan wek hewildanên dewleta tirk ên ku dixwaze hêzên Başûr li dijî gerîla têxe şer, dinirxînin. Ji bo hêzên herêmî neyên vê lîstika dewleta tirk jî hişyarî dikin.

Lê belê di vê demê de tevî van hamû hişyarî û nerazîbûnan jî rêvebiriya PDK'ê têkiliyên xwe yên bi dewleta tirk re qut nekirin. Di bingeha vê hevkariyê de hevdîtinên di meha borî de bi beşdariya Wezareta Pêşmerge û Fermandariya Operasyonên Hevpar a Iraqê, fermandarên tirk û endamên MÎT'ê du hevdîtin pêk anîn. Hevdîtina yekem li baregeha leşkerî ya tirk a li Batûfa û ya din jî li herêma Barzan pêk hat.

Derket holê ku li gorî plansaziya hat çêkirin dê li herêma Boselê 2, li herêma Derkarê 2 û li silsileya Kerê jî 4 noqteyên leşkerî werin avakirin. Bi vê plansaziyê ve ji PDK'ê hat xwestin ku li herêma Metîna, Girê Ortê, Qela Saddam û li sêkoşeya gundê Brîfka wê baregehên nû ava bike.

Ev baregeh li gel meşandina xebatên îstîxbarî wê bixwazin qadên gerîla dorpêç bikin. Ji xwe ev demek dirêje li herêmê PDK agahiyên îstîxbaratî bi PDK'ê re parve dikin. Bingeha îstîxbarata êrişên hewayî ên li dijî Mexmûr, Şengal û herêma Metînayê bi hevkariya PDK'ê ya bi dewleta tirk re pêş dikeve. Bêgûman hevkar û berpirsiyarê van komkujiyên li başûrê Kurdistanê pêk tên rêvebiriya PDK'ê ye.

Êrîşên dawî ên li dijî pêşmergeyan û êrîşa li ser Mexmûrê jî provokasyoneke KDP-Tirkiyeyê ye. Armanca van êrîşan jî ew e ku bi israr dixwazin PKK'ê bikşînin ser xeta şerê "navxweyî". Ji bo di vê mijarê de bigihêjin armanca xwe jî gelê Başûr û peşmergeyan jî wek amûrekî bi kar tînin.

Ji bo di vê polîtîkaya xwe ya şer de biser bikevin di nav hewildanên ku gelê Başûr bi birçîbûnê terbiye bikin de ne. Nedayîna mûçeyên gel, qutkirina alîkariya civakî û xizmetguzarî bi vê polîtîkayê ve girêdayî ye.

Ji bo êrîşa li dijî konvoya PDK'ê, HPG bi awayekî fermî banga lêkolînê kir. Bi vê bangê re girêdayî divê li herêmê nexşeya hereketa balafirên artêşa tirk destnîşan dike jî bê lêkolînkirin. Dîsa di dema ku êrîş pêk hatiye de balafirên kîjan welatî li ser esimanên herêmê difiriyan divê bê lêkolînkirin û ji raya giştî re bê aşkera kirin.

Ji ber ku di tevahiya sehaya hewayî ya Iraqê de balafir û radarên keşfê yên Amerîkayê dixebitin, haya wan ji hemû liv û tevgera hewayî hene. Lewma di vê mijarê de di kêliyên ku ev êrîş pêk hatine balafirên keşfê ên artêşa tirk li herêmên hebûn an nebûn dikare bi hêsanî bê zelal kirin.

Bêgûman armanca hêzên navneteweyî yên ku ji bo provokasyonên PDK'ê û dewleta tirk qada hewayî vekirine li gor berjewendiyên xwe Kurdistanê û Rojhilata Navîn dîzayn kirin e.

Wisa diyar e ku hêzên nevneteweyî PKK'ê li pêşiya dîzaynkirina herêmê asteng dibînin. Lewma dema mirov vê polîtîkayê li ber çava digire hewildanên PDK'ê tasfiyekirin ango lewazkirina Tevgera Azadiyê hîn baştir tên famkirin.

Li aliyê din siyasetmedarên ku van provakasyonan wekî siyaseta dewleta tirk a domdirêj ya ku hêzên Başûr bixe nav şerê li dijî PKK'ê dinirxînin û ji bo ku xwîna navxweyî neyê rijandin jî hemû aktoran hişyar dikin.

Piştî hewildanên provokatîf ên PDK'ê bi pêşengiya Partiya Komunîst a Kurdistanê li Hewlerê pêşberê avahiya parlamentoya herêma Kurdistanê çalakiyek protestoyî li dar xistin.

Di çalakiyê de Partiya Komunîst a Kurdistanê daxuyaniyek da û got: "Em hêvî dikin ku her kes li dijî êrîşên dewleta tirk a dagirker bibe xwedî helwest û em doza derxistina dewleta tirk ji başûrê Kurdistanê dikin."

Li ser zêdebûna bertekan cîgirê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubat Talabanî jî daxuyaniyeke nivîskî dabû û gotibû; "Mafê kesî tuneye ku berê gelê me bidin ber kişandina êşan."

Ev mijara her ku diçe germtir dibe di rojave hevserokê YNK'ê Lahor Şêx Cengî de jî bû. Lahor Şêx Cengî bi fermandarê pêşmergeyan re rûnişt û di civînê de ev peyam da. "Bi tu awayî nebin aliyekî şerê navxweyî." Di dewamê de Lahor Şêx Cengî dide diyarkirin ku xwîna di navbera kurdan de birije dê zirarek mezin bide gelê kurd û herêmê.

Li ser hewildanên provokatîf ên PDK û dewleta tirk, PKK'ê jî daxuyaniyeke nivîskî da. Di daxuyaniyê de tê gotin ku bi zanebûn nûçeyên gerîla êrîşî hêzên PDK'ê kiriye tên servîskirin. Ji xwe tu delîlên ku gerîla êrîş kiriye jî li ber destan nîne.

Di encama van pêşketinan de tiştaku tê dîtin bi hevkariya PDK'ê dewleta tirk dixwaze îradeya kurdên azad ji holê rake. Divê hemû aliyên xwedî nirx û wijdan xwedî li destkeftiyên gelê kurd ên ku di bedêla êşên mezin de hatine bidestxistin, derkeve.

Ev erkekî niştimanî û sereke ye. Şerekî di nav kurdan de wê li her çar parçeyên Kurdistanê destkeftiyên kurdan tune bike.

# Encamên qutkirina ava Çemê Firatê

**Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî Tirkiyeyê ava Çemê Firatê qut kir rewşa herêmê ber bi karesatê mezin ve diçe û roj bi roj hejmara kesên ji ber avê jehrî dibin zêdetir dibin**

Navenda Nûçeyan

Tirkiye ji 27'ê çileyê ve ava Çemê Firatê li ser şêniyên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê qut kiriye. Qutkirina ava çem bandorê li ser ceyranê, çandiniyê, ava vexwarinê û gelek tiştên din dike.



Tirkiye di demên dawîn de, tevahî rêbazên şerê taybet an jî yekser ji bo koçberkirina şêniyên herêmê bi kar anîn.

**Peymana avê**

Li gorî peymana ku di sala 1987'an de di navbera hikûmetên Sûriye û Tirkiyeyê de hatiye îmzekirin, divê dewleta tirk di her saniyekê de zêdetirî 500 metrekab avê ber bi Sûriyeyê ve berde û Iraq jî ji sedî 58 para xwe jê wergire. Lê dewleta tirk ji zêdetirî 4 meh û nîvan ve kêmtirî 200 metrekab di her saniyekê de berdide.

Bi kêmbûna ava Firatê re karesateke mezin a mirovî li pêşiya xelkê herêmê ye. Ji niha ve gelek stasyonê ku ava vexwarinê vediguhêzin bajarên wekî Dêrazor, Hesekê, Kobanê, Tebqa û hin deverên din ên ji ber kêmbûna avê, nema dixebitin.

**Dibe sedema karesatan**

Her wiha karesata herî mezin jî di warê tenduristiyê de derdikeve holê. Hejmara kesên ji ber avê jehrî dibin her diçe zêdetir dibe. Yên herî zêde zirar ji ber kêmbûna ava çem dîbînin, şêniyên kantona Kobanê ne ku bi xetereya jehrîbûnê rû bi rû mane. Helbet bilindbûna germahiyê, qirêjî û kevza di nava avê de jî dibin sedemên ku hejmara kesên jehrî dibin zêdetir bibe.

**Jehrîbûna ji ber avê**

Têkildarî mijarê Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Herêma Firatê Ehmed Mehmûd axivî û diyar kir ku di encama qirêjbûna ava Çemê Firatê de, li Kobanê zêdetirî hezar û 377 kes jehrî bûn, piraniya wan jî ji navçeyên Qenayê û Sirînê ne.

Mehmûd di berdewama axaftina xwe de behsa sedemên jehrîbûnê kir û ev tişt anî ziman: "Şênî avê yekser ji çem vedixwin. Ji ber ava çemê kufik girtiye û pêdivî bi madeyên klorê heye ku paqij bibe. Li gel wê jî saziya avê, ava ku tê Kobanê paqij dike."

**Dê hejmar zêde bibe**

Ehmed Mehmûd ragihand ku bi rewşa zêdebûna germahiyê re dê van mehên li pêşiya wan hejmar zêdetir bibe û wiha domand: "Îhtîmal e ku rewşên jehrîbûnê di vê mehê de zêde bibin, bi taybet jî bi hatina havîn û bilindbûna pileya germahiyê re,çem zêde qirêjî dibin. Lê çareyek heye ku ev rewş derbas bibe. Ew jî paqijkirina avê ya bi klorê ye yan jî beriya av were vexwarin bê kelandin."

Hewceyî gotinêye ku germahiya bilind rêjeya qirêjbûna avê zêde dike, ji ber ku oksîjenê di avê de kêm dibe, pêdiviya avê bi pileya 15 derece heye ku oksîjena xwe biparêze. Lê di havînê de û li gel pileya zêdetirî 40 dereceyî qirêjbûna avê zêde dibe.



# Rakirina hin ambargoyên li dijî Îranê bû cihê nerazîbûnan

Navenda Nûçeyan

Piştî ku DYA'yê di encama hevdîtinên bi Îranê re hin ambargoyên li ser wê rakirin. Ev yek di nava raya giştî ya cîhanê de bû mijara pirsa 'gelo dê Îranê çiqasî ji rakirina wan ambargoyan sûdê bigire.'

Nêzî 2 mehan e hevdîtinên di navbera heyetên DYA û Îranê de yên ji bo vegera li peymana nukleerî berdewam dikin. Ev hevdîtin gelek caran gihane cihê aloz û ber bi xitimînê ve diçûn. Lewre DYA'yê ji bo pêşîvekirina li berdewamiya hevdîtinan hin ambargoyên li ser hikûmeta Îranê betal kirin.

Ambargoya ku berê DYA'yê li dijî 3 berpirsên hikûmeta Îranê û 2 şirketên wê ferz kiribû, hatin betalkirin.

Li gorî daxuyaniya Wezareta Xezîneya Amerîkayê wan ambargoya li ser 3 siyasetmedarên îranî rakiriye ku di nava wan de serokê şirketa Petrola Neteweyî ya Îranê Ehmed Qalîbanî jî heye.

Dema ku sedemê vê yekê ji rayedarên DYA'yê tê pirsîn ew bersivên wiha didin: "Van kes û şirketan liv û tevgerên xwe dane guhertin." Lê ev bersiv pêşiya lêkolîna vê mijarê nagire û her pirsa ku çima ew ambargo hatine rakirin, tê kirin. Her wiha rayedarên DYA'yê her bi vê pirsê re rû bi rû ne û ji wan wiha tê pirsîn: "Heke bi rastî wan kesan an jî şirketan liv û tevgerên xwe guhertibin, gelo ew liv û tevger çi ne û çawa guhertine."

Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê Edward Price li ser pirsa rojnamevanekî wiha bersiv dabû: "Em liv û tevgera wan kes û şirketên ku me ambargo daniye ser wan, dişopînin û dinêrin ka guhertin tê de heye an na û tu têkliya vê biryarê bi hevdîtinên ji bo vegera li peymana nukleerî ya bi Îranê re, tune ye."

Ji aliyekî din ve Şêwirmendê Ewlekariya Neteweyî yê berê Antonio Rogerio ji rojnameya Journal Street re axivî û derheqî mijarê de wiha got: " Rakirina van ambargoyan di dema hevdîtinên ji bo peymana Nukleerî de dê wekî qelsiyekê werin şîrovekirin û Îranê sor dike ku hewldanên xwe yên ji bo bidestxistina çekên nukleerî berdewam bike."

Her wiha ev yek ji aliyên gelek siyasetmedarên komarparêz ve bû mijara nerazîbûnê li hember siyasetên nû yên rêveberiya DYA'yê û serokatiya Joe Biden.

# Okyanûsa 5'emîn li nexşeyê hat zêdekirin

Navenda Nûçeyan

National Geographicê roja sêşemê daxuyaniyek da û diyar kir ku ava li dora Antarktîkayê bi rengekî fermî weke okyanûsa 5'emîn a cîhanê nas dike. Navê wê jî Okyanûsa Başûr e.

Wekî ku tê zanîn li ser nexşeyê tenê 4 okyanûs hene. Okyanûsên Atlantîk, Pasîfîk, Hînt û Arktîk. Bi vê guhertinê re rêxistinê nexşeya cîhanê ji nû ve xêz kir û bi navê Okyanûsa Başûr okyanûsek lê hat zêdekirin.

Têkildarî mijarê Erdnîgêrê National Geogprahic Society Alex Tait ji kovarê re axivî û wiha got: "Okyanûsa Başûr demeke dirêj e ji aliyê zanyaran ve tê naskirin, lê belê ji ber ku li qada navneteweyî lihevkirin tune bû, me nedikarî bi rengekî fermî nas bikira."

Alex Tait da zanîn ku ev yek ji hin aliyan ve rewşeke neyînî ya cografî ye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Me her tim destnîşan kir, lê belê me wekî ji okyanûsên din cudatir destnîşan kir. Ji ber ku ji aliyê ekolojîk ve cihê ye û em dixwazin vê okyanûsê nas bikin."

H. Halît Alaçati

# KDP bi şûrê tirkan êrîşî kurdan dike

Têkiliyên KDP'ê yên bi Tirkiyeyê re tên zanîn. Êdî pêwistî nîne ku mirov van têkiliyan dubare bike. Li tevahiya cîhanê li dîroka şer û têkoşînên rizgariya neteweyî binêrin. Têkiliyên hêzekê bi dagirkeran re çawa hatine pênasekirin pir zelal e. Peymanên polîtîk, aborî û leşkerî yên bi dagirkeran re li hemberî hêzek neteweyî re tên çêkirin bi teqez wekî îxanetê hatine pênasekirin. Ev yek di makezagonên hemû welatan de wekî zagon hatine derxistin.

KDP îro hêzek bi dewleta dagirker a tirk re peymanên aborî, leşkerî û siyasî yên li dijî berjewendiyên kurdan û hêzên kurd ên siyasî çêkirine. Ji dagirkeran hêz digire û bi vê hêzê hewil dide hêzên din ên kurdan tune bike. Ev Peyman ne nepenî ne. Ne KDP ne jî dewleta tirk a dagirker vê têkilî û van peymanan naveşêre. Heta KDP ji dagirkeran zêdetir van peymanan bi awayek bêşerm dipareze.

Gelo KDP çima êrîşî hemû hêzên kurd, hêviyên gelê kurd û pêşeroja Kurdistanê dike? Ev yek jî gelek zelal e. KDP teslimî dewleta tirk bûye. Ji bilî talîmatên dagirker zêdetir tiştek nikare bike. Ji xwe polîtîkayên wê yên li hemberî hemû hêzên kurd û bi taybetî Tevgera Azadiya Kurdistanê li gorî polîtîkayên dewleta dagirker teşe digirin.

Sedema rageşiya li Başûr ku ev hefteyek e vegeriyan e êrîşan jî ev talimatên dewleta tirk in. Ev ne şîroveyek e û ne jî texmînek e. Ev agahiyek dagirker û çapemeniya wê vedibêje ye. Çawa? Îktîdara faşist a AKP-MHP'ê li hemberî têkoşîn û berxwedana Tevgera Azadiya Kurdistanê li tevahiya Rojhilata Navîn winda kir. Ligel hemû hêza xwe ya dewletî jî nekarî bi ser bikeve. Hemû derfetên xwe yên aborî di vê riyê de xerc kirin.

Qrîzek hundirîn a kûr dijî. Her roj beşek jê vediqete. Mafyaya li hemberî kurdan bi kar anîn êdî derdikevin televîzyonan û sûcdarên li dijî mirovahiyê yên AKP-MHP'ê vedibêjin. Çeteyên li hemberî kurdan bi kar anîn li Libya û Suriyeyê Erdogan şermezar dikin. Di hundir de qrîza aborî, siyasî û civakî kûr dibe. Tiştek Erdogan bike êdî nemaye.

Pêwistiya Erdogan bi serkeftinekê heye. Lê ji ber ku li Lîbya, Deryaya Spî, Sûriye û Iraqê winda kir, niha tenê riyek di deste wî de maye. Ji bo vê dixwaze tevkujiya kurdan pêk bîne û vê yekê wekî serkeftinekê nişan bide. Li ser vê yekê bi zêdekirina nijadperestiyê li ser piyan bimîne. Erdogan-Bahçelî dizanin ku vê yekê nekin dê serê wan bê firandin.

Ji bo serê wan nefire dixwazin komkujiyê li ser kurdan pêk bînin. Ev gelek zelal e. Lê bi hêza xwe nikarin. Di van çend salên dawiyê de ev pir zelal derket holê. Herî dawî li Garê têk çûn. Niha pêwistiya wan bi alîkariyê heye. Ji ber ku têkçûye wekî berê nikare hêz û alîkariyê ji derve bistîne. Ji bo wê dixwaze komkujiya kurdan bi deste KDP'ê pêk bîne.

KDP jî bûye dildarê vê yekê. Niha bûye şûrê tirkan û dixwaze li ser navê Erdogan-Bahçelî serê kurdan bifirîne. Hêzên wekî Gulan û Zêrevan ên ji aliyê tirkan ve hatine perwerdekirin û çekên tirkan li milan e êrîşî şervanên azadiya Kurdistanê dikin. Dewleta tirk ji hewa ve bombeyan li şervanên azadiyê dibarîne, xwefiroşên KDP'ê jî ji bejahî êrîşî şervanan dikin.

Ji ber ku dewleta dagirker talîmat daye. Erdogan-Bahçelî ji bo canê xwe xilas bikin, dixwazin di demek kin de komkujiya gelê kurd pêk bînin. Nexwe dê di demek kin de têk biçin. Ji bo wê ji KDP'ê û xwefiroşên wê re dixwazin êrîş bikin. Ew jî niha êrîşê dibin ser sengerên şervanan. Ji ber ku KDP jî hêzek gendêlî kirî, zengîniyên gelê kurd pêşkêşî dewleta tirk kiriye. Heta qirika xwe ketiye nav çala herî û qirêjiyê. Ketiye destê dagirkeran. Ji ber qirêjiyên li hemberî gelê kurd pêk anî, xwe spartiye dagirkeran.

Xuya ye ku KDP dê vê îxanetê ranewestîne. Bixwaze jî êdî nikare. Tevgera Azadiya Kurdistanê jî çewa heta niha li hemû qadên heyîn li dijî dagirkeran heta guleya dawiyê têkoşiya ye, dê li hemberî îxanetkar û xwefiroşan jî têbikoşe. Ji bo wê divê kes xwe nexapîne. Vê rewşê wekî "Şerê birakujiyê" bi nav neke. Ev ne şerê birakujiyê ye. Ev şerê welatperwerî û îxanetê ye. Îxanet ser bikeve dê dagirker serbikevin û Kurdistan winda bike. Welatperwer jî ser bikevin dê dagirker û îxanetkar têk biçin.

Bi vê boneyê divê hemû kurd hişyar bin. Divê helwesta xwe zelal daynin holê. Aliyê xwe zelal bike. An alîgirên îxanetê ne an jî alîgirên azadiyê ne. Her tişt gelek zelal e. Tiştek pir hêsan heye. Ew jî divê her kurdek bêje, "Hêzek li ser navê kurdan êrîşî hêzek din a kurdan dike îxanetkar e." Kesek vê pênaseya herî hêsan neke ew jî bi bêdengiya xwe hêz dide îxanetkariyê. Bila kes nebêje şer naqewime. Hind sînor hene. KDP bi êrîşên xwe yên dawiyê ev sînor derbas kirin.

Tenê hêzek heye ku pêşiya vê yekê bigire. Ew jî bertek û helwesta gelê kurd e. Bêdengî û bêalîtî xizmeta îxanetê dike. Ji bo vê divê herkes aliyê xwe zelal bike. Destê xwe danê ser wijdana xwe û bersiva vê pirsê bide "Gelo çima KDP niha bi çekdarî li pêşiya leşkerên tirk êrîşî gêrilayên HPG'ê dike?" bide. Li gorî vê bersivê jî divê helwesta xwe zelal bike. Ku hema niha, îro rewşenbîr, hunermend, nivîskar, sîyasetmedar, karker, karmend, dayîk û bavên kurd vê helwestê nîşan neke. Hemû destkeftiyên gelê kurd dê tune bibin.

Roj roja deng derxistinê, helwest nîşan danê û xwedî li hebûna xwe derketinê ye.

# Rastî dikare mirov biêşîne lê qet kesî şermezar nabe!




Kakşar Oremar



Van dem û rojên em tê de ne mijarên ku mirov bixwaze li ser binivîse, gelek in. Hemû mijar jî girîng in û girêdayî qeder, paşeroj û rewşa me kurdên hemû Kurdistanê ne. Dema êşek weke baranê bi ser aliyêkî Kurdistanê da dibare, zêdetir ji dengê feqîr û hejaran wira, hinek dixwazin hemû civak dengê wan bibihîze!. Xwe hunermend, rewşenbîr, nivîskar, siyasetzan û heta xwediyên dozê dihesibînin. Ez ê di vê nivîsê de navê hinek kesan li rex helwesta wan binivîsim û hêvîdarim bêyî dilmayîn bizanin ka armanc çi ye û çima wiha dinivîsim. Bila ew ji bîr nekin ku: **Rastî dikare mirov biêşîne lê qet kesî şermezar nabe.**

**Çar mijar û peyamên pê re**



**(1)**
**Helwesta hunermendiyê**

Nizamettîn Arîç ku salên dirêj e li ser hunera kurdî dixebite bi rêya twittekê li ser şehîdbûna pênc pêşmergeyên kurd wiha nivîsiye: "Kuştina yekî ji me, kuştina dilê me hemûyan e…!"

Ew li kêleka çend hunermendên din bi salan hunermendê dilê min bû. Dengê wî zimanê wan êşên min yên xedar û nekewandî bû ku dema min guhdar dikir hestên min vedihesîn, êş jî vedikewîn, lê dema ez dinêrim ku ji sala 1984'an û pêde ku gerîlayên kurd şerê artêşa wê dewletê dikin ku hebûn N. Ariç jî napejirînin û ew heta peyvekê jî li pey şehîdkirina gerîlayan nanivîse, navê wî weke hunermend ji dilê min tê derxistin. Edalet di peyamên wiha de tune, wijdan mirî û ez baweriyê bi hunera stranbêjên wiha nakim. Bi rêya kesên wiha dibe ku gelek hêvî bêne şikandin lê ez li hemberî kesên wiha di wê baweriyê de me ku hêvî heta ji serkeftinê jî bi rûmetir e. Kesên xwe di asteke bilind a rewşenbîrî û hunerî de dibînin pêwîst e di şerên wiha giran de weke rûspiyên malbateke mezin hemû aliyan bibînin. Dema ku hêşta bi zelalî diyar nîne ka ew pêşmerge çawa hatine şehîdkirin, N. Arîç jî divê hesabekê jî peyamên xwe re bike. Kesên wiha dema ku xwe hunermendê gelekî bindest dihesibînin nabe wiha rihet xwe ji dilê xelkê derxînin. Kesên ji êş, xem û jana jiyana aliyekî re ker lê xwe weke bilbilê hinek aliyan bidin nîşan dan, ew ne mirov, ne xwedî wijdan, ne zana, ne rewşenbîr û ne jî hunermend in. Bi karên wiha re tenê peyva fesadî li kêleka navê wan zêde dibe. Hêvîdar im di çavê wan rengê xwîna pêşmerge û gerîla weke hev bê dîtin û di şerên wiha da karekî bikin ku partiyên kurdan nêzî hev bin û peyveke wan nebe sedema nakokiyên civakî. Pêwîst e hunermend ger di derya hunerê de mende, ji herkesî zêdetir xwedî wijdan û dilovanî be.



**( 2 )**
**Helwesta Edhem Barzanî**

Sala 1991'an dema Şivan Perwer bi dengekî bilind diqêriya: "Bijî Kurdistan, bimre koledar…" hezaran kes ji kurdên başûrê Kurdistanê pê re rabûne ser piyan û gotina wî sedbare dikirin. Wê demê hemû serokên kurd li wir amade bûn û peyama Şivan Perwer geha Enqere, Tehran, Bexda û Şamê jî. Wan salan hêvî pir mezin bûn ku lîder û partiyên siyasî bigihêjin hev û bi deng û hêzeke mezin xebata xwe berdewam bikin. Lê mixabin wiha nemeşî û bi çêbûna şerê navxweyî re hezaran kes, hêvî bêreng û dengê azadîxwazan hate nizimkirin. Wan salan dîsa siyasetmedarê kurd Edhem Barzanî bû ku banga aştiyê û diyalogê dikir. Di van çend salên derbasbûyî da li dijî siyaseta dagîrkeriya dewleta Tirkiyeyê ew tim xwedî helwesteke kurdistanî bûye. Herdem hişyarî daye desthilatdarên kurd li başûr û li ser pêngavên zêdexwazî yên Erdogan ew şiyar kirine. Tu guman tê de nîne ku hinek berpirsên PDK'ê ku herî dawiyê bi daxûyaniyên xwe re dixwestin agirê şerekî din yê xwekujiyê bidin destpêkirin, bi merema vala derxistina banga Edhem Barzanî karekî wiha dane meşandin. Elbet ferqeke mezin di navbera wan berpirsên gendel û rêzdarên mîna Edhem Barzanî de hebûye û heta rêveberiya PDK'ê jî wan gendel û dizên naskirî baştir ji me tevan dinase. Bi wê banga dawiyê re rêzdar Edhem Barzanî ramanên xwe yên Kurdistanî weke siyasetmedarekî dûrbîn kirin malê dîroka Kurdistanê. Kesên wiha ne ku ku siberojê yê li hemberî doz û dîroka gelê xwe şermezarî gel nebin. Karekî wiha pîroz nikare di kurtenivîseke wiha de bê beyankirin lê bila wijdana E. Barzanî rihet be û niha zêdetir ji hemû serkêşên doza Kurdistanê li Başûr di nava dilê xelkê de cihê xwe vekir. Hêvîdar im pêngavên mezintir jî ji hêla kesayetiyên wiha ve bêne hilanîn.



**( 3 )**
**Banga Murat Karayilan**

Şerê van rojan dîroka sedan salên bihûrî li Kurdistanê bi bîra me tîne. Împeratorên mezin li ser singê axa welat00ê me qedera xwe dane diyarkirin, lê bi hêz, xwîn, wêrankarî û talana terş û malê me peymanên wan yên dawiyê hatine îmzakirin. Her kes dîsa ket nava koşkên xwe lê hejarî, birçîtî, paşkeftin û berdewamiya gendeliyên berpirsên dewletên navendî li Kurdistanê berdewam kirin.

Ji 2014'an û şûnde şerê gerîla û pêşmergeyên kurd li dijî DAIŞ'ê nûbûnek di rûpelên jiyana kurdan de afirand. Herî dawiyê berxwedana şervanên kurd xelîfeyê koşkên Enqereyê û cigirê rêbaza siltanên Osmanî neçar kir ku bi dizî şandeyekê bişîne serê çiyayên Kurdistanê ku şer bê rawestan. Berxwedana kela Dimdim tevî hemû canfedayî û sekina li hemberî hovîtiyên leşkerên Sefewiyan hingî rastî şikestê hat dema ku hinek kurdên xayîn hevkariya dijmin kirin. Gotina herî balkêş a van rojan di tûrên civakî de M. Karayilan beyan dike: ***"Erdogan ji me re xeber şand û got:"Li dijî me şer rawestînin, li beşên din hûn çi dikin em xwe têkil nakin". Yanî dixwest bêje: madem PDK hêriş dike, hûn jî şerê wan bikin. Min dixwest vê meseleyê ji rêzdar Mesud Barzanî re bêjim ku bizane Tirkiye dijminekî metirsîdar e".***

Gelo ev peyam ne bi wê wateyê ye ku gerîlayan bi berxwedana Garê re plan û projeyên siltanê Enqerê têkdane?

Di rewşên wiha da erkên dikevin pêşberî me çi ne? Bawerî bi îrade û hevgirtina hev an jî belavkirina peyamên ku agirê dubendî û bêtifaqiyê kûrtir bikin.



**( 4 )**
**Sedat Peker û belgeyên dewleteke fasid**

Hemû kurd dizanin Sedat Peker kî ye û pirî caran têhnatiya xwe bi xwîna kurdan şikandiye. Ew zarê dewleteke mafyayî û heya dawiyê di fesadê de werbûyî de ye ku îro Erdogan jê re serkêşiyê dike. Di axaftinên wî de hem mijara kurdan heye û him jî hevkariya dewleta Tirkiyeyê bi komên terorîst re ku bi rêya wî: çek, teqemenî û cebilxane digihînin DAIŞ, El-Nusra û cihadîstên serjêker. Ew bi zelalî dide diyarkirin ku ew komên cinayetkar bi hebûna xwe dispêrin Erdogan û xelîfeyê Bexdadî. Gelo haya raya giştî ya cîhanê ji van hevkariyên dijmirovahiyê tunebû? Gelo di şertên wiha de çima ragihandin, rewşenbîrên tirk û çalakvanên qadên din bêdeng in? Aya ez dikarim bêjim: **Gelo li Tirkiyeyê ku bi rêya dîktatoran tê birêvebirin: rewşenbîr weke keriyên pez in ku mejiyê wan hatiye zincîrkirin û riha wan jî zindanîkirî ye!"**

Belkî carê haya me ji kar û kiryarên mafyayekî weke S. Peker tunebin, lê gotinên wî gendelî û terorîstbûna hakimên Enqereyê baş dide selmandin. Ev jî bû destpêka pêvajoya ku herfindina xana sîstema antîdemokrat a di bin serkêşiya AKP-MHP'ê de bileztir bike. Bi çêbûna rewşeke wiha re peyamên dîrokî ji raya giştî a cihanê, Yekitiya Ewropa û welatên weke Amerîka, Rusya û Çînê re hene. Pê re jî doza siyasî a ku li dijî bizava azadîxwaziya kurd li Kurdistanê heye, baştir tê naskirin.



Necat Ayaz

## Bantûstana Başûr

Bantûstan peyveke di wateya "welatê bantûyan" de ye û di dema rejîma apartheid a Afrîkaya Başûr de hatiye bikaranîn. Rejîma nîjadperest ji bo afrîkiyên reşik û spî ji hev veqetîne di salên 1940'an de vê mijarê aniye rojevê û bi Qanûna Otonomiya Welatîbûna Bantû ya di 1970'î de kiraseke fermî li vê polîtîkayê kiriye. Bi vê qanûnê, ji bo afrikiyên reşik herêmên xweser û heta ji vê wêdetir, xwedêgiravî herêmên serbixwe hatine damezirandin. Ev herêm xwedî erkên bisînorkirî bûn û ji aliyê dewletê ve dihatin fînansekirin. Bi milyonan afrikiyên li van herêman di bin dorpêçê de bûn û ji mafên welatîbûna dewletê bêpar bûn.

Yek ji armancên dewletê ya damezrandina Bantûstanan parçekirina tevgera afrikiyên reşik bû ku pêşengiya wê ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (ANC) ve dihat kirin. Bi taybetî Bantûstana zûlû ya bi navê KwaZûlû û Tevgera Azadiya Çandî ya Neteweyî ya Înkata bi awayekî aktîf qasî 20 sal li hemberê ANC'ê hatin bikaranîn. Serokê tevgerê Mangosûtû Bûtelezî bû dûvikê rejîma apartheidê û mîlîsên zûlû ji aliyê artêşa nîjadperest ve hatin perwerdekirin. Piştî hilweşandina rejîma li ser bingeha serdestiya afrikiyên spî hatibû damezrandin, Bantûstan ji hev hatin xistin û hemû erdên wan tevlî dewleta nû bû. Afrikiyên reşik û resen ku di asta neteweyî de ji mafên temsiliyeta siyasî bêpar hatibûn hiştin, wekî afrikiyên spî bûn xwedî heman mafî. Bi rola xwe ya bêyom a wekî çekeke di destê kolonyalîzmê de, Bantûstan li cîhanê wekî modeleke xeternak a li dijî mafên neteweyî û civakî hat qebûlkirin. Polîtîkayên Srî Lankayê yên li hemberî welatên tamîlan, bi polîtîkayên bantûstanên li Afrîkaya Başûr hatin miqayesekirin û rêvebiriya vî welatî hat tometbarkirin. Her wiha, rewşa dalîtên li Hindistanê wekî afrikiyên bantûstanan hat pênasekirin û Hîndistan bi nîjadperestiyê hat sûcdarkirin. Piştî aştiya li Afrîkaya Başûr û bidawîbûna rejîma apartheid, êdî ev mesele bi lez ji rojevê derket û Bantûstan bi tenê bû mijareke literatura sîstema nîjadperestiyê.

Wisa xuya ye ev meseleya ku zû de ye nîqaş li ser nayê kirin, bi êrişên Tirkiyeyê yên dawî careke din dibe realîteyek siyasî ya îro. Tirkiye ev nêzîkî du meh in bi destûra hikûmeta Başûr li herêmeke fireh operasyoneke giran dimeşîne. Sînorên Başûr tên binpêkirin, bi valakirina gundan korîdoreke dirêj a bêkurd tê avakirin. Sîstema baregehên leşkerî ya ji dehan navendên wekî keleyan pêk tên, pirsên îlhaqê tînin rojevê. Diyar e ku herêma Kurdistanê kontrola li ser parçeyeke mezin a erdên xwe winda kiriye. Û bêdengbûna wê nîşan dide, hikûmeta herêmî gav bi gav proseya hilweşandina otonomiya xwe qebûl kiriye.

Dema mirov realîteya dawî ya li başûr bi ya dema rejîma nîjadperest a Afrîkaya Başûr re bide her hev, dikare qala destpêka bantûstanbûyina başûr bike. Bantûstanên li Afrîkaya Başûr li ser kaxizê xweser heta hin ji wan serbixwe bûn. Lê kontrola esas di destê dewletê de bû û rejîma apartheidê kengî bixwesta dikaribû midaxaleya van herêmên bikira. Tirkiye jî heta niha kengî xwest ket nava erdên başûr, bi peymanên petrolê hîkûmeta herêmî ji aliyê aboriyê ve bi xwe girêda û heta perwerdeya leşkerî da pêşmergeyan. Lewma jî hevkariya bi Tirkiyeyê re ji dijberiya her du aliyan a li hemberê PKK'ê derbastir kiriye û veguheriye têkiliya bi efendiyekê re. Bêguman ev efendî Tirkiye ye û Başûr jî êdî ne herêmeke federal e lê herêmeke ber bi bantûstanbûyinê ve ye.

# Kenanoglu: Vera elewîyan tehlukeyê hêrişî esto

Parlementerê HDPyî Alî Kenanogluyî pare kerd ke eşkerayîyê serçeteyê tirkî Sedat Pekero ke îtîrafanê xeylê muhîman kerd ke vera elewîyan do provakasyon bêro kerdene girîng ê. Kenanogluyî ard ziwan ke elewîyî cara şîyar ê

Serçeteyê tirkî Sedat Pekerî twitter de îtîraf kerd ke dewleta tirke ha vera elewîyan peyê provakasyonan de ya. Parlementerê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Alî Kenanogluyî derheqê mesele de qisey kerd û da zanayene ke selahîyetdarêkê Asayîşî Serekê Cemxaneyê Garîp Dedeyî babete ser o şîyar kerd.

Kenanogluyî wextêk serekîya Komeleya Kulturê Elewîyan ya Hubyar Sultanî kerdo û bîyo hetkarê serekê Federasyonê Elewîyan yê Bektaşîyam.

Kenanogluyî destpêkê qiseykerdişê xo de eşkera kerd ke îtîrafê Pekerî ra verî asayîşê hêzanê tirkan ra selahîyetdarêkî Serekê Cemxaneyê Garîp Dedeyî Celal Firatî rê telefon kerd û derheqê provakasyonan de şîyar kerdo.

Kenanogluyî da zanayene ke hewte de 4-5 hezar merdimî Cemxaneyê Garîp Dedeyî zîyaret kenê û wina dewam kerd: "No selahîyetdar zî serekê cemxaneyî rê vano tay agahîyî estê û wa baldar bê. Telefonî ra di rojan dima Pekerî nê tweetî nuştî. Ma zanenê mesele cidî ya. Serekê cemxaneyî Serekê Federasyonê Komeleyanê Elewîyan o û ey zî pêro dezgehê elewîyan şîyar kerdî. Ma sey elewîyan tim şîyar ê. Tim nê welatî de vera elewîyan tehlukeyê hêrişê muxtemelî esto.'' ***STENBOL***



# Çimeyê Munzurî eleqeya turîstan ancenê

Bajarêko qedîm. Dêrsimo ke 40 çimeyê awe ê ci estî û mîyanê şarî de çîme bimbarek yenê zanayene, hetê dînî, komelkî, polîtîk, tarîx û cografyaya xo ra wayîrê nasnameyêkê xoser o. Dêrsim nê rojan de pê hêrişanê vera cografyaya xo û ameyîşê demê turîstan ra rojdem de yo. Dêrsim menga hamnanî de wareyêko tewr honiko û semedo ke rindîya xozaya Dêrsimî û cayê gêrayîşî ê ci xeylê zêdeyê bala herkesî anceno. Dêrsim nê mewsîmî de meymananê xo pêşwazî keno. Xeylê bajar û heta welatan ra turîstî yenê semedê vînayîşê xozaya Dêrsimî.

Dêrsim hezaran serrî yo ke yeno pawitene la Mudirîya Herême ya Pawitişê Gandarê Xoza û Kulturî ya Xarpêtî serra 2001î de Çimeyê Munzurî sey cayê yewine ê sîtî îlan kerde û na rewşe bî sebebê reaksîyonan.

Na cografyaya rinde ra tay cayî Çemê Munzurî mabênê Dêrsim û qezaya Pulurî de ca gêno. Mîyanê çemî gandarê tewer bi tewirî estî û dormeyê ci de zî reyna vaşê tewir bi tewirî zergûn benê. Na herêma rinde de eynî wext de heywankarî zî yeno kerene û wareyanê ci de heywan yenê weyekerdene. Dêrsim û cayê turîstîkî ê sey ci aşma hezîrane de dest bi pêşwazîkerdişê turîstan kenê.



Wexto ke qala Dêrsimî bêro kerdene sere de Çimeyê Munzurî yenê vîrê herkesî. Rindîya xozaya Dêrsimî ra yew zî Çimeyê Munzurî yo. Çimeyê Munzurî 64 kîlometre dûrê merkezê bajarî yê. Awa Çimeyan binê erdî ra vejêna û bi rindîya xo zîyaretçîyan şaş vera dana. Wesayîtê ke şonê nê çimeyan zî qezaya Pulurî ra wurzenê ra.

Tabî nê rindîyan ra yew zî Çemê Mircanî yo. Çemê Mircanî mîyanê sînorê Çemê Munzurî de maneno. Çemê Mercanî merkezê Dêrsimî ra bi 63 kîlometreyan dûrî yo.

Welatanê dûrî ra daxî turîstî yenê

Heto bîn de ALlmanya, Swêd, Danîmarka, Întîltere, Belçîka û xeylê welat û bajaranê cîya cîyayan ra zî zîyaretçîyê Çimeyanê Munzurî estî. Meraqdaranê xozaya Dêrsimî ra yew welatîyê Amerîka yo. Welatîyê Amerîka bajarê Los Angelesî ra semedê vînayîşê Dêrsimî ameyo û vano: "Ez xeylê welatanê Ewropa gêraya la ez nêbîya şahidê rindîyêk winasî. Her çîyê tîya weş o. Bîyayîşê rindîyêka winasî kêfweşî dano merdimî." ***DÊRSIM***

# Dewaya bodrumê Cizîrî ame redkerdene

Wextê xoverdayîşê xoîdarekerdişî de 3 cêrzemînê taxa Cûdî ya Cizîrî de qirkerdiş amebi kerdene. Muracatê seba akerdişê dewa 21ê nîsane de ame redkerdene. Mehkemeya Qanûnê Bingeyî bira redkerdişî Rojnameyê Fermîyî de weşanaye. Mehkeme seke wextê dewaya Roboskî de kerd pê bahaneya 'dokumentî kêm ê' dewa red kerde.

Dewaya yewine û diyîne zî hema zî dewam kenê. Goreyê agahîyan derheqê muracatanê nê dewayan de kêmasîyêke çin a û cigêrayîşî dewam kenê. ***ŞIRNEX***



# ÎSÎG: 8 serrê peyênan de tewr tay 513 doman merdî

Meslîcê Asayîşê Kar û Weşîya Karkeran ya Stenbolî (ÎSÎG) raporê xo yê derheqê cînayetê domanan ê sere karî de hadre kerd. Goreyê raporî 8 serrê peyênan de tewr tay 513 doman kar ser de merdî. Rapor de ame vatene ke padîyayîşê mekteban bîyo sebebê zêdebîyayîşê hûmara domanê karkeran û Tirkîya de tewr tay 2 mîlyon karkerê domain estê.

Rapor de semedê vernîgirewtişê karkerîya domanan nê pêşnîyazî ameyî kerdene:

"*Ganî sîstem û polîtîkayê perwerdeyî ke zemînê keda domanan ercan keno, fek polîtîkayanê xo ra vera bido.

*Ganî dayeyê derheqê keda domanan bi hawayêko zanist û asayîş raşt bêro weşanayene.

*Ganî şexs û dezgeyê ke domanan bêqeyd danê xebetnayene nêrî peygoşkerdene û şertê înan ê cuye bêrî başkerdene.

*Ganî pêroyê domanan bê pere û awayêko asayîş kontrolê weşîye ra bêrî derbazkerdene û şertê înan ê cuye bêrî başkerdene.

*Ganî karkerîya domanan bêra qedexekerdene." ***STENBOL***





## Nêwazenê bibî karkerê mewsîmî

Rihayijê ke kêmîbîyayîşê awe vera fek dewe û erdê xo ra vera dayî, vayeya mesrefan, birnayîşê cereyan, vayeya awe, derman, gubre û mazotî vera xeylê zehmetîyan ancenê. Citkarê rihayijî dîyar kerdê ke eke wina dewam bikero ê do mecbur bimanê ke fek karkerîya mewsîmî ra vera bidî. Remzî Aya (58) ke dewa Girê Huşk de karê ramitişî kena dîyar kerde ke domanîya xo ra nata karê mewsîmî kena û vat ke eke dewa înan de problemê awe bêro çareserkerdene ê do şorê erdî xo de ramitiş bikerê. Heto bin de welatiyan ra Îbrahîm Şen (35) û Mahmut Kizgît ê Sêwregî yê 60 serrî zî qisey kerdî û vatî ke ê nêwazenê bibî karkerê mewsîmî. ***RIHA***

## Pasûr de berardişê lulikê birîsimî

Qezaya Pasûrî ya Amedî de demê berardişê lulikê birîsim destpêkerd. Qezaya Pasûrî sey merkezê berardişê lulikê birîsimî yena zanayene. Berardoxkarê lulikê birîsimî berardişê kozayan kenê û nê kozayan ra qumaşê birîsim û xalî yenê viraştene. Kozayî Borsaya Tîcaretî ya kehen ya Amedî rê yenê rotene. Badê engkerdişê dewan zî berardiş ame verê vindetişî û Borsaya Lulikî ke vayeya lulikan dîyar kerdêne serra 1994î de bî tarîx. ***AMED***

## Hemserekê neweyî yê HDKyî

Kongreya Demokratîke ya Şaran (HDK) perarê bi slogana Cuyeya newîye do ser bikewo Heyetê Pêroyî yê 11. Pê ard. Esengule Demîr û Cengîz Çîçek sey hemserekanê neweyan ê HDPyî ameyî weçînayene û 105 endamê Meclîsê Pêroyî newe ra ameyî weçînayene. Hemsereke Esengule Demira ke tîya de qisey kerde bale ante yewîya dewletemafya-sîyasetî ser û vat: "Ganî vera nê îqtîdarî şarî bibê yew û têkoşînî pîlêr bikerê. Ganî ma pêro pîya hêzê bikerê yew û ke bieşkê cuya newîye înşa bikerê." ***ANQARA***

## Çewlîg de firtine virazîya

Badê îqazê meteorolojîyî Çewlîg de va û firtine virazîya. Va û firtine Çewlîg binê tesîrê xo. Firtine vera sacê dikan û keyeyan firayî û dîmenê nê gaman ame qeydkerdene. Tewr zêde herêma Sanayî ya taxa Sîmanî de firtine tesîrê xo nawit û zirarî madî virazîya. ***ÇEWLÎG***

## Yek mûmik

Rojekê kurdo û tirko bi hev re diçin bajêr, dîsa mijar dora siwarbûna hespê ye:

Kurdo ji hevalê xwe re dibêje heke ku destûra te hebe ez ê li hespê siwar bibim û stranekê bibêjim û ku strana min xelas bû îca ez ê dakevim û tu li hespê siwar bibe, baş e?

Tirko dibêje bi şertekî! Kurdo dibêje; ê de baş e kanê şertê xwe bibêje? Tirko şertê xwe dibêje ,binihêre lê lê û lo lo nîne ha! Kurdo dibêje na na, lê lê û lo lo nîne. Kurdo li hespê siwar dibe û îca dest bi strana yek mûmikê dike. Yek mûmik, du mûmik, sê mûmik, çar mûmik, pênc mûmik, yazdeh mûmik, bîst û heft mûmik werhasil bi hejmara hezar û nehsed û pêncî mûmikan re digihîjin bajêr. Pêdiviyên xwe dikirin û vedigerin, di vegerê de yê tirk hewl dide ku li hespê siwar bibe, kurdo dibêje hop hop, hêj strana min xelas nebûye û li hespê siwar dibe û dîsa dest bi hejmara mûmikan dike .

Dema ku tên binê gund, kurdo dibêje çar hezar û nehsed û not û penc mûmik û ji hespê dadikeve xwarê.

Yê tirk dibêje te çima temam nekir? Te çima nekir pênc hezar û axaftina xwe didomîne, bi telaq, kargehekî herî pêşketî jî, di nava du sê saetan de nikare ewqas mûmikan çêke! Helal be ji te re.

***Riza Uyar***




## Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Ez çûme malekê, mirmira du şêran
De bêjin ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye;
Ez çûme rêkekê,
mamê mişt ji wê ve tê
Piştiyê li nîva piştê
Min gotê mamo tu yê bi ku ve çî?
Got, ez ê çime biheştê.

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî ne ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin e-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
**1-** Aş **2-** Jîjo, jojî

## Zûgotinok

Îro me dîsa çend zûgotinok ji we re peyda kirin. De werin em pirsa xwe bikin;

Kî dikare 3 caran li ser hev bêje?

**Çav bi kil e dil bê kul e, pî dikule**
**Lê ye fistanekî tev bi gul e**

→ Heke ew ne bû vê zûgotinokê biceribîne:


**Kerê zer di rêz de dizirê**

→ Lê ku ew jî nebû bêguman tuyê bikaribî vê bêjî. De ka 3 caran bêje:

**Bivirê badayî di qula mar de mayî**



## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Hezar kîlo 5. Cînavkek yekjimarî 7. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê 8. Paşdaçekek
9. Şêwe, awa 13. Hunermendeke ermenî yê ku bi kurdî stran digotin
14. Pêxemberek 16. Dohnê ku pê xwarin tê çêkirin
19. Weşanxaneyeke kurdan 20. Rojeke hefteyê 21. Kûçik
22. Heywaneke bi saw û jehrî 25. Noteke muzîkê
26. Paytexta Yewnanistanê 28. Xebata çekdarî ya ji bo standina mafên rewa.

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Paşnavê hunermendeke kurd Îsa ......
2. Weke, wekî
3. Cînavkek di rewşa tewandî de
4. Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga û gamêşan
6. Fediyokî
10. Jora xanî
11. Ne qalind, tenik
12. Rengek
15. Sembola şoreşa Kobanê
17. Vexwarineke bi alkol
18. Alaveke ku xwarin tê de tê çêkirin, qûşxane
20. Meheke salê
23. Rengek
24. Awayê benglêkirina xuşka mezin
27. Agir

Bersiva hefteya borî



# Çend gotin li ser belgefîlma 'Jin'ê

Bêrîvan Kayi

**Belgefîlma bi navê Jin (Woman-en) a ku derhênerî û senaryoya wê ji aliyê Anastasia Mikova û Yann Arthus-Bertrand ve hatiye çêkirin ji 50 welatî, behsa çîrok û hestên 2 hezar jinan dike**

Gelek caran mirov dikeve nav meraqeke ku gelo li cîhanê em çend kes wek hev difikirin, dijîn, çi hîs dikin, çawa hîs dikin û çi dibêjin. Bi hezaran kîlometreyan mirovên ji hevûdu dûr, xwedî erdnigariyeke cuda di kîjan alî ve ji hevûdu cuda ne, yan wekhev in, an jî tu eleqeya wan bi hevûdu re tune ye. Ango erdnîgarî bandoreke çawa dide rûyê mirovan, çi li mirov kêm û zêde dike, çandeke çawa ava dike. Bi dehan bersiva pirsên bi vî rengî em dikarin ku di belgefîlma bi navê Human (Mirov) û Women (Jin) de bibîne. Lê di vê nivîsê ez dixwazim kêm be jî ji we re tenê qala belgefîlma 'Women' bikim.

Derhênêr û senarîstên belgefîlma bi navê Jin, Anastasia Mikova û Yann Arthus-Bertrand in. Di vê belgefîlma ku ji 50 welatên cuda nêzî 2 hezar jin tê de axivîne mirov dibe qey, cîhan tev dibe weletekî jinan. Wek honaka zanistî ya Charlotte Perkins Gilmanê û Girava Lesbosê Yewnenistanê ya ku helbestvana yewnanî Sapho pêşengtiyê ji van jinan re dike. (Heredotê yewnanî di pirtûka xwe ya bi navê 'Dîrok'ê de behsa helbestvana jin Saphoyê dike) Bi deng, hest, fikr, xeml, şekl û şemal, meyzandin, ken, bêdengî û afirîneriya du hezar jinan xebateke balkêş û jinwarî ye.

**Dengê du hezar jinên cuda**

Gotineke her jineke di vê bêlgefîlmê de ji aliyekî rastiya rolên civaka zayendperestiyê ji aliyê din ve jî xeta serhildêr a li hemberî ku jinan tune dihesibîne radixe ber çavan. Ji jinên siyasetmedar, dayik, hevjîn, xwîşk, hunermend, lezbiyen, laşfiroş, şoreşger heta jinên di nav kabileyan de, yên wek 'mêran' hatine mezinkirin, jinên kedkar û hwd. fikrê jinên ji 50 welatên cuda em dibihîsin, difikirin û dibêjin 'aha ev jina afrîqî wek min difikire, ev dayik wek dayika min e, tiştа ku brîtanyayî dibêje, tev li dibim...' Yanî portreyên jinên ji welatên cuda û xwedî çandên cuda, portreyên ji dil in û mirov zêde ferq nake ku ya li pêşberî mirov belgefîlmek e.

**Qedrajeke berfireh**

Ev belgefîlma ku bi qedrajeke berfireh jinên cîhanê anîne gel hev di heman demê de em dikarin wek fersendeke ronîkirina bêedaletiya li ser jinan jî bînin. Jinên ku di her kêliyê de, di her quncikeke jiyanê de, di malê de, di dîrokê de û di her qadên jiyanê de rastî tunehesibandin, zext û zimanekî tund, zor û zehmetiyan hatine. Ji ber vê yekê jî 'Belgefîlma Jin'ê wek eynik ango ronahiya vê rastiya ku li her deverê cîhanê bi heman rengî ye.




**Rêwîtiya hestên jinên cîhanê**

Li gel vê yekê Mikova û Arthus bi taybetî bi vê xebatê xwestine ku herî zêde balê bikişînin ser rêwîtiya hestên jinên cîhanê, hêza van û hestên wan. Her wiha ji portreyên jinên herî bi hêz heta yên ku li hember cîhanê tu helwest û hêviya wan tuneyî, ji jinên afirîner heta yên ku tenê dane pey jiyana ji wan re hatiye amadekirin, hatine xêzkirin. Armanca vê belgefîlmê ne tenê gerîna li pey şopa mafê jinan û pirsgirêkên globalî yên li ser pişt jinan e; di heman demê de li pey çareseriya van pirsgirêkan û lihevkirineke ji bo di navbera her du cînsan de ye jî.

**Hin gotinên jinan**

Dema em li hin gotinên jinên di belgefîlmê de meyze dikin wiha ne; 'Rengê wan cînsê wan, nijada wan her çi dibe bila bibe, bi porên hîtî û bi ya xelekî jin bi her awayî li deverî rêzgirtinê heq dikin'. 'Ez wek jinekî wisa hîs dikim ku ez dikarim di kêliyekî de cîhanê bigeuherînim'. 'Li gorî min dayikeke ku ji zarokekî astengdar re dayiktiyê dike, kedkara herî pîroz e'.



## Serlêdanên xelata Apê Mûsa dest pê kir

28'emîn Xelatên Rojnamegeriyê yên Şehîdên Çapemeniya Azad a Mûsa Anter îsal jî tê lidarxistin. Serlêdanên ji bo pêşbirkê dest pê kirin. Pêşbirk ango xelat di beşên 'Nûçeyên kurdî', 'Nûçeyên tirkî', 'Wêne (wêneyên nûçeyan)', 'Karîkatûr' û 'Nûçeyên jinan' were lidarxistin. Endamên pêşbirkê dê di 18'ê îlonê de bên aşkerakirin.

Pêşbirk îsal jî ji aliyê Rojnameya Yenî Yaşamê ve tê lidarxistin. Zimanê pêşbirkê kurmancî û tirkî ye û ji 5 beşan pêk tê. Beşa 'Nûçeyên Jinan' ji bo bîranîna rojnameger Gurbetellî Ersoz tê lidarxistin.

Her beşdar dikare bi beşekê û berhemek beşdarî pêşbirkê bibe. Pêşbirk di her beşê de ji aliyê endamên jûriyê ve tê nirxandin. Beşdarek herî dawî dikare di 10'ê îlona 2021'an de serî li pêşbirkê bide û aşkerakirina xelatan jî di 18'ê îlonê de ye.

Divê beşdar berhema xwe bi rêya PTT ango kargoyê bişîne û her wiha dikare rasterast bi dest jî radestî rojnameyê bike. Berhemên ku ji ber posta û kargoyê negihîje cihê xwe xwediyê berhem berpirsiyar e. ***STENBOL***

# Antolojiya Dengbêjên Botanê


Bi navê 'Antolojiya Dengbêjên Botanê' nivîskar Bahadîn Robar pirtûkek derxist. Pirtûka ku ji Weşanên Arê derketî qala 10 jê jin 63 dengbêjên Botanê dike.

Nivîskar Bahadîn Robar têkildarî berhema xwe axivî û diyar kir ku herêma Botanê di warê çandî de herêmeke pir dewlemend e û ji dîrokê heya niha pêşengiya wêjeyê kiriye lê belê ev zengîniya wê pir nehatiye berbiçavkirin.

Robar anî ziman ku ji ber vê pirtûkek bi vî rengî amade kiriye û armanca wî ew bû ku tevkariya dengbêjên Botanê ya ji bo ziman û wêjeya kurdî bide xuyakirin.

Di axaftina xwe de Robar destnîşan kir ku gava dest bi xebatên vê pirtûkê kiriye, li herêmê tenê 10 dengbêj nas dikirin, lê bi xebata Antolojiyê gelek navên nû û dengên nû bihîstine.

Robar diyar kir ku derbarê 80 kesî de agahî berhev kirine lê belê di berhema xwe de cih daye 63 kesan û wiha domand: "Me hevdîtin bi malbata dengbêjên wekî Seîd Axayê Cizîrî re kirin û me çîrokên wan berhev kirin."




Robar bal kişand ser dengbêj Feqe Xalidê Sehdo û wiha got: "Çavkaniya kilamên Mihemed Arifê Cizrawî, Meryem Xan, Nesrîn Şêrwan hwd. ku di radyoya Bexdayê de gotine, yên Feqe Xalidê Sehdo ye. Kilama Eyşana Elî ku me ji Cizrawî guhdar kiriye, kilama Feqe Xalidê Sehdo ye."

Nivîskar Robar destnîşan kir ku piraniya dengbêjên ku wî hevdîtin bi wan re kiriye, ji dayikên xwe hînî dengbêjiyê bûne û wiha axivî: "Ev jî nîşan dide ku dayik dengbêjiyê digihînin nifşên nû. Min çîroka 10 jinên dengbêj ên ji Botanê nivîsand. Piraniya wan an ne sax in an jî koçî metrepolan bûne. Lê li ser jiyana Meryem Xan, Ne'ma Xelîl, Xezala Eliyê Mijinî hûr bûm." ***ŞIRNEX***

# Li Duhokê mîhrîcana fîlman dest pê dike

Mîhrîcana Fîlman a Duhokê ya Navneteweyî dê mîhrîcana xwe ya 8'emîn li dar bixe. Ji bo mîhrîcanê ser lêdan dest pê kiriye.

Festîvalê li ser malpera xwe têkildarî serlêdanê destnîşan kir ku serdema serlêdanê daye destpêkirin û got ku kesên bixwazin tev li bibin ji 2'ê hezîranê heta 1'ê tebaxa 2021'î dikarin berhemên xwe bişînin.

Mîhrîcan di du beşan de berheman qebûl dike, beşa yekem 'Sînemaya Kurdan' ya duyem jî 'Sînemaya Cîhanê' ye.

Di her du beşan de jî yên bixwazin dikarin fîlmên xwe yên metrajdirêj, kurtefîlm û belgefîlmên xwe bişînin.

Ji bo yên bixwazin serî lê bidin bi sernava 'SERÎLÊDANA FESTÎVALA DUHOKÊ' dikarin tev li bibin. ***DUHOK***




# Kubar bi hejmara 5'an derket

Kovara Kubar a ku bi awayekî dijîtal çap dibe, bi hejmara xwe ya 5'emîn derket.

Edîtoryaya Kubarê ji aliyê Ayşenûr Ozel ve tê kirin. Di hejmara nû de, li ser berga kovarê hevpeyvîna bi Leila Lois a balerîna kurd re hatiye kirin, heye. Loisê qala kar, huner û jiyana xwe kiriye.

Kubar di naveroka xwe de gelek mijarên wek cil û bergên li pêş, modaya cîhanê, trendên dawî yên jin û mêran, mijara tendrustiya diranan, pêşniyarên qir û qahfên derman û gelek mijarên din girtine dest.

Kovarê di nava rûpelên xwe de hevpeyvîneke din jî weşandiye. Ev heypevyîn jî bi model Xira Raeyê re hatiye kirin. ***AMED***



xwebûn

14-20 Hezîran 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 78

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Du Seyidxan an jî bêdengî û sewtek

Hoşeng Elî

*Wexta babet ji bergeha mirinê derdikeve û li rex hev rêz dibe, muzîka ku pêşbîniya sermedî ya mayindebûyî dike; teseliyekê dide û hundirê zemanê nevedîtî yê ji mirina talî dûr disekine, dadigire.*
*Theodor W. Adorno*

Ji bo çûyinê gava min amadekariya xwe dikir dilekî min jî digot: "Lo, her der girtî û ji xwe ezman jî kelogirî... tu yê niha herî çi bikî? Lê dîsa hevalê min ez vexwendibûm, nedibû, her wiha eyb bû! Min şêwirmendî kiribû û diviyabû ez li wir, li ber wê dika qamek bilind ez rûniştama û kêmasî û zêdehiyê lîstikê bi ser hev dana. Erê ez qala şanoyekê dikim. Tuncay Ozel, him wek derhêner û him jî wek nivîskarê wê, bo cara ewil lîstikek dadihêne û dixwest ez lê binêrim bê ka qelsî û xurtiya wê çi û çi ne?

Di wan rojan de lîstika bi navê "Bêrû" ji aliyê walî, qeymekam, şaredar û hema bêje Dewleta Alî Osman tev de, bi eleqeyeke mezin dihat pêşwazîkirin yanê rojên pir xweş bûn. Bi vê munasebetê me yê jî li "Sû Gosterî Salonû" li lîstika 'Em mane li ber dîwaran' temaşe bikira. Min xwe nêzî saet şeşan gihand cihê lîstikê. Berî lîstik dest pê bike li hundir, li ser kursîka xwe rûniştibûm û difikirim. Bi carekê girmoliyek çêbû li devê derî; ken, şitexalî û hwd. Lê di nav wê girmoliyê de dengekî balkêş hebû, ew deng jî "hia hia hia..." wer didomiya. Ên li hundir yekser daqûlî derve bûn û kirin pistepist di bin guhê hev de. Lê tu kesî ne madê xwe dikir û ne jî ji yekî/ê re digot, ew çi dibe? Te digot qey bes ê di nav wan de ez bi tenê me bi mat û matmayî û bi miraq! Deng, deng û deng çiqas çû nêz hat û deng di ber min re wek çeng filitî û berbijêr ve bû wek du teyrên hevreng. Min ji xwe re got haho! Heke wisa bidome em ê çawa zoqî temaşekirina wê şanoyê bibin. Û bû çingîniya naqosê. Wext dihat lîstikvan hazir û amade li ser dikê li paş dikê li benda me...

Lîstikê dest pê kir pê re jî deng... Di nav vê keftûleftê de lîstik qediya lê tişta bala min kişand ew deng di nav wê demê de bû perçeyekî şanoyê û kesekî jî acizî jê nekir. Wext çû zeman herikî, *kortal hilweşiya, çiya qulibî hat xwarê* û deng şewitî. Cara ewil bû min Seyidxan (ne)nas dikir. Min nizanibû ew camêrê dengzîv Seyidxan e ew ê ku car caran bi dengê wî kilam tên ser serê zimanê min.




**Bîra deng e Seyidxan**

*Armanca heqîqî ya hunerê ne teqlîdkirina xwezayê ye, di cihê xweza lê asê dimîne dayîna alîkariyê ye.*
*Sidney FINKELSTEIN*

Bi rasthatinekê ez li hevpeyvîneke Seyidxan rast hatim. Behs dikir, behsa kela xwe, behsa rûmayinên xwe, behsa şikestinên xwe wek ku behsa bîr'êşên xwe bike behs dikir. Lê di her peyvê de di her herikîna hêvokên xwe de car li ser carê, ken li ser kenê, bişirîn li ser bişirînê bû. Yek cara behsa zarokatiyê û yek caran jî dihat û li ser milletê xwe; yek caran li ser êşa xwe û yek caran jî li ser neteweya xwe radiwestiya, lê her û her dikeniya, dibişirî.

Meha çûyî ya îlonê wî albûmeke bi navê "BÎR" saz kiribû ku di nav de him ên ji destên wî him jî kilam-stranên gelêrî hebûn, derçû. Di her gohdarkirinê de ta'mek û çêjek xwe radipelikîne ezmanê guhên mirov wî ta bi ta, derzî bi derzî dihonîne. Bi amûrên nûjen wan kilaman ji nû ve vedijîne, ji nû ve wan dirijîne.

Û Seyidxan behs dike, dibêje: mektep; mektep kerb e, mektep derb e, mektep kaş e, mektep serê te ye û di nav destê qerraş e. Mektep dor e, mektep sor e, mektep li ser dilê şûşeyî gindor e. Mektep şûr e, mektep ji kuştinê re meşhûr e. Mektep naqos e, mektep ne di ser re di kokê de diquse. Mektep kêr e, mektep hêsirên min dihêre.

Axirîn mektep ne tu xêr e...

Seyidxan didomîne: Hunera min ne bixwe dilşewitîne. Hunera min bi her du çeplên xwe, xwe bilindkirin e.

Lê guhdarim. 'Mozelanê' aheng, peyv, enstrûman û hwd. Wek deşta Wêranşarê di ber min re diherike. Di labîrenta hundirê min de her tişt zerzele ye, hir tişt qiyametek e ku ser bûye bin. Şano, bîr, hemşo... nizanim xwe bi kijan aliyî de bidim hişê min kuder e? Deşt li min vedinişt, ber bi bin xetê ve diçim cihê ku av lê dibe ar. Kujînekên ku hêmayên kortalî lê tên xwar! Bi strana "Wahar" her çar hêlê min yekser diêşin her çar aliyê min bi derbekê dilerizin. Û her çar hêlê min hîn û hîn perîşan in.

Stran diqede lixwevegerîn dest pê dike. Şikêra derdora Wêranşarê di serê min de ava dibe. Pirs wek teyrê ji zinaran şemitîbe, ber bi min ve tên û dipirsim te qet bawer dikir ew 'Deng' bibe balyozek û li te bikeve? Te qet bawer dikir ew ecêbmayinên qaşo entelektuelî birûxin bi yek dengî ve? Bifêr ha Bifêr e...

**Du Seyidxan du bîr...**

Seyidxanê ewil ker û yê din jî sewta xwedê.

...di çeperê de wek xweşmêran li dijî romê têdikoşiya bi çapelî û martînî û santûr û gîtar. Seyidxanê ewil ji kurê xwe Elîcan re digot: "Lêxe lawo lêxe bextê romê kêm e." Wî ji Şêxê Pîranê re serbazî kiribû û bi gurregurra topan guh tefandibû. Şer qediya bû şer çikiya bû, gûza me dîsa li ser qubbê netebitî bû û nesekinî bû. Piştî vegerîna serhedê, romê digot: "Cih û warê we tune ye li ser rûyê vê dinyayê..."

Lo axao axao axao... rabe heçî dîwana egîdê mala bavê min tê de rûniştîbe bila kes rûnenê xeberê kin û dirêj nebêje. Û Seyidxan bi heta Mêrdînê wek şûrê ji kewdanka xwe aciz dipekiya li der û dorê...

Seyidxanê din jî ji Sêrtê difilite û li Eskîşehîrê kon vedide. Sermayeya wî zimanê wî ku ew jî jê re qedexe ye. Ewil bi tirkî distrê, lê paşê li xwe wardiqile û peyv bi peyv, gotin bi gotin bi pey zimanê xwe dikeve. Di her sehkirinê, di her şitexalî û galgalê de ew tûrê xwe dadigire. Dil, dil, wî li pey xwe dibe. Êdî her tîp û peyv jê re lêdaneke dilê wî bixwe ye. "Ez di halê mecnûn de me şeydayê dilê min tu yî" dibêje û meşa xwe didomîne.

Û Seyîdxanê ewil? Ew jî di bin gidîşa genim de bû libek xulî û li rast û ezmanê welatê xwe belav bû.

***Çavkanî;***

***ADORNO, W. Theodor. (2018). Müzik Yazıları. Yapı Kredi yayınları; istanbul.***

***FINKELSTEIN, Sidney. (2000). Müzik Neyi Anlatır. Kaynak yayınları; İstanbul.***

***https://www.youtube.com/watch?v=7crHc6yQkeY***

***https://www.youtube.com/watch?v=ObVKbvSRwAw&list=RDObVKbvSRwAw&start_radio=1&t=0***

## Ji bo her du Seyidxanan Lawij'ek

Do, îro û sibê
her çi ji we kêm mabe, we
çi li dû xwe hiştibe û her çi dibe
eşq, welat, deng û rê...
bihêle bila bê digot, bila bê
wê rojê li wê newalê, girmoleke leşker wek çiya çiriya
be û agirê hundir biherike
çongên wê, diherikî.
Elîcan li bavê xwe dinêrî, bê liv û lebat, lê hundirê wî
hundirê wî bahozekî dîn,
ferat bû ferat!
Li bavê xwe nêrî ...
Seyidxan qutiya xwe derxistibû, tûtina kirîvê wî yê Xursî ku digot tim û tim ez wê av didim bihost bi bihost ez wê diramûsim bi qelîştekê destan li ser kaxiza spî erebî reşand û got: "Berî cengê divê tu hundirê xwe bitebitînî Elîcanê min, berî şer divê tu hêrsê biçînî di hundirê xwe de, lat bi lat."
Daket,
pê re jî baran
li her neqebê li serê her çiyayî dilop bi dilop herikî
zanîbû, serê xwe rakir û ji bo cara dawîn çavên xwe wek du şetan ber bi qirika xwe ve herikand.
Û yê din,
kela wî ji dêvla tenbûrê lê didê
tiliyên wî devê lûla tivingê
kenê wî şaxên dara kinêrê.
santûr, ji têlên xwe bi fedî, agirê wê şevê ji du hinaran sortir disotî.
Wê şevê
kilam bi kilam êşiya, stran bi stran bariya, wê şevê ser her du çavên Seyîdxan...
Her ku dixwest biqîre li mektep, otobos û cih û war
lê kom dibûn lê sor dibûn,
bi carekê dibûn barbar.
Û deng û ew dengê ku ji zorê dikir laş perçe bikira
neditebitî, nedisekinî di tu ran û demaran de
îcar bizanibe ey welat
çendîn hêjane lawên te
bê kêl û gorn bê cih û war.

# Peyo mîna bijîşkan nexweşan baş dike

Me hemûyan bihîstiye ku ajal wek terapîst dixebitin û mirovan baş dikin. Hespê bi navê "Peyo" ê 15 salî ev demeke dirêj e rojên xwe li Nexweşxaneya Calais ya Fransayê derbas dike û nexweşên ku bi penceşêrê ketine, baş dike. Xasma jî mirovên ku ber bi dawiya temenê xwe ve hatine bextewar dike.

Peyo di destpêkê de ji bo pêşbirkan hatiye perwerdekirin lê xwediyê wî Hassen Bouchakour piştî demekê dîtiye ku hin hunerên wî yên din hene. Piştî pêşbirkê Peyo her tim ber bi mirovan çûye û xwestiye li gel wan bisekine. Xasma jî ew kesên nexweş hildibijêre û xwe bêhtir nêzî wan dike. Paşê jî xwediyê wî biryarê dide ku Peyo ji pêşbirkên hespan dûr bixe û bi nexweşên ku pêdiviya wan pê heye, bide naskirin.

Hassen û Peyo bi dilxwazî li nexweşxaneyê dixebitin. Peyo êdî wek "Bijîşk Peyo" tê naskirin. Peyo diçe ber deriyê nexweşan û li wir piyê xwe bilind dike, gava ku ew piyê xwe bilind dike, Hassen fêhm dike ku Peyo dixwaze bi wî nexweşî re wext derbas bike û wî bextewar bike. Hebûna Peyo ji bo nexweşan wek terapiyê ye, nexweş xwe li gel Peyo bextewar hîs dikin û ji xemên xwe dûr dikevin. Xasma jî nexweşên penceşêrê.

Hassen dibêje, "Gava ew biryarê bide, ez nikarim wî bigirim û bi dilê wî ye, ji dilê wî tê ev yek. Ew gava tiştekî hîs bike, diçe li gel nexweşan disekine û ji ba wan venaqete. Hebûna wî êşa nexweşan kêm dike û enerjiyê dide nexweşan û nexweş pêdivî bi dermanan nabînin. Kontrol hemû di destê wî de ye ez tenê li pey wî diçim." ***Çavkanî: Yenî Ozgur Polîtîka***



